peyam

Jimar 1
Îlon 2012
Buha 5 TL

Li pey roniya wehyê...

Kovara çandî hunerî û ramanî ya mehane



Îslam!

Baweriya Rast û Îstîqamet

www.arsivakurdi.org

Raman û Bingeha Sekularîzmê

Bingeha Baweriyê Quran

Qisseya Yûsuf Eleyhîsselam

diwana kitêbên Kurdî...





















www.arsivakurdi.org

Weşanên Dîwan
Zeyrek Mah. İtfaiye Cad. No: 17/3 Fatih İstanbul | **Tel**: 0212 534 48 30 | **e-mail**: diwankitab@gmail.com



KOVRA ÇANDÎ HUNERÎ
Û RAMANÎ YA MEHANE

Weşanên Dîwan
Xwedî (Sahibi)
Muhammet Kurşun

Navnîşan
Weşanên Dîwan
Zeyrek Mah. İtfaiye Cad. No: 17/3 Fatih İSTANBUL
Tel: 0212 534 48 30
e-mail:
kovarapeyam@gmail.com

Berpirsê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
İsmet Aydemir

Editor
Mihemed Jiyan

Rûpelsazî
Şemal Medya

Jimar 1
Îlon 2012
Yerel Süreli Yayın

Çap
Berdan Matbaası
Sadık Daşdoğen Davutpaşa Cd. Güven San. Sit. C Blok No: 239 Topkapı/İSTANBUL
Tel: 0212 613 12 11

Her nivîskar ji naveroka nivîsa xwe mesûl e. Nivîsên ji kovarê re hatine, bi şûn de nayên vegerandin.

NAVEROK

Raman û Bingehê Sekularîzmê -I-
Dr. Ebdulkerîmê Surûş
Werger: **Dr. Lezgînê Çalî** / Tîpguhêzî: **Umîd Demîrhan** 3

Îro ji dest husna hebîb
Feqiyê Teyran 9

Şîretên Hekîmê Loqman
Osman Îzol 13

Însan û Jiyan
Mele Emînê Botikî 15

Îman-Bawerî di Însan de Fitrî ye
M. Reşîdê Hiritî 19

Beşa Dudoyê Ku Rîsaleya Dudoyan e Der Heqê Remezanê de ye
Bedîuzzeman Seîdê Kurdî
Werger: **Abdulkadir Bingöl** 21

Alim û Şairekî Wenda: Siyahpoş
Mehabad Hêlîn 27

Ehemmiyeta Çûna li Pey Sunneta Pêxember (s)
M. Ebdusselamê Şad 31

Umdetul Ehkam **Îmamê Meqdisî**
Werger û şîroveyên pêwist: **Umîd Demîrhan** 35

Warê Îmtihanê
Murad Celalî 39

Qisseya Hezretî Yûsuf û Girîngiya Wê
Celîl Cewher 44

Ji Munebbîhata Îbnul Hecerê Esqelanî:
Wesfên însanên qenc û yên xerab
Ji Erebî: **Mela Emînê Botikî** 46

Sê Çîrokên Bi Hîkmet
M. Xalid Sadînî 50

"Dîwana Kurmancî" klasîkan dide nasîn
Husein Muhammed 54

Îslam
Fikrî Amedî 56

Baweriya rast û îstîqamet
Mihemed Jiyan 62

www.arsivakurd.org

Ji Edîtor

BI NAVÊ XWEDAYÊ MIHRÎBAN Û DILOVAN

Silav û bereketa Xwedê li ser we be.

Xwendevanên hêja,

Bi reng, deng û bêhneke nû ji we tevan re merheba. Em bi kovareke nû û nefeseke taze di hizûra we de ne. Navê kovara me Peyam e ku maneya wê rîsalet e, yanî mesaj. Ji zemanekî dirêj ve ye ku me dixwest vê Peyamê bigihînin we û bi we re hemhal bibin. Lê şert û mercên dinyayê ew qasî giran in ku dest nadin meriv daxwazên xwe di wextê wan de bîne cih. Ji ber vê yekê em derengî jî mabin, va ye em hatin û li muqabilî we ne. Em bawer in ku wê di dilê we yê fireh û comerd de, cihek ji me re jî hebe. Lewra em dixwazin bibin mêvanê dilê we û hûn jî bibin mazûvanê dilê me. Em dixwazin têkiliyên me, muameleya me û muhebbeta me qelbî be û li ser daxwaza rizaya îlahî hatibe avakirin. Baweriya me ew e ku têkilî û muhebbeta ku li ser rizaya îlahî nehatibe avakirin û qelb li muqabilî hev germ nebûbin, di wê de xêr tuneye. Herwiha bereket û înayeta Xwedê teala jî ji wê derê kêm e. Ji ber van sedeman jî, em dixwazin di vê jiyana dinyayê ya çend rojî de bi însanan re têkiliyeke qelbî deynin û bila li ser vê qubbeya mezin ya dinyayê sedayeke xweş ji me bimîne.

Silavên Xwedê lê bin Resûlê Ekrem di hedîseke xwe de wiha kerem dike: "Kenîn û bişirîna te ya di rûyê birayê de sedeqe ye", dîsa di hedîsekê de kerem dike: "Misilman ew e ku Misilmanên din ji dest û zimanê wî emîn bin." Eger em bikaribin dostaniyeke li ser emîntiyê û biratiyeke li ser baweriya rast ava bikin, emê li vê dinyayê jî û li axretê jî heyateke xweş derbas bikin.

Hêvî û daxwaza me ew e ku em peyama wehya îlahî bi şeklê herî saf û zalal bigihînin ber destê we xwendevanên hêja û ezîz. Herwiha bi arîkarî û piştgiriya we jî, bikin ku vê peyama ji bo xelasiya însaniyetê hatiye, baştir were fêmkirin û bigihê zêdetir însanan.

Wekî me got, Peyama me binêt e ku peyama wehyê bi mînaktiya Resûlullah eleyhîsselam bigihîne ber destê însanan. Em bingeha xwe ji kitêba mutehher û saf û îlhama xwe jî ji baweriya xwe ya mezin û qewîn distînin. Kaniya me Quran e û qûtê me jî sunneta Resûlullah e. Heta ji me bê, qewet û îmkanên me hebin û zanîna me têr bike emê xîret bikin ku ev peyam domdar be û her rojê biqewettir be.

Di vê jimara me ya yekem de nivîsên ji hev hêjatir û xweştir cih digirin. Înş, dema ku we rûpelên kovarê gerandin, hûnê jî bibînin ku nivîsên li ser dînê Îslamê û Sunneta Resûlê Ekrem gelekî hêja û fêdedar in.

Em hêvîdar in ku ev jimara me ya yekem jimareke bi dilê we be. Herwiha em ji we daxwaz û rica dikin ku hûn pêşniyarî, şîret û nesîhetên xwe bigihînin me. Me ji nêrînên xwe mehrûm nehêlin da ku em kar û xebatên baştir bikin.

Heta jimareke din emanetî Rebbê Alemê bin

Edîtoriya Peyamê

www.arsivakurdi.org

Raman û Bingehê Sekularîzmê -I-

Dr. Ebdulkerîmê Surûş

Werger: Dr. Lezgînê Çalî
Tîpguhêzî: Umîd Demîrhan

Rêvebirina zanistî ya civakê û siyasetê hevkûfî wê bûyerê ye, ku di warê xweriskê da qewimiye. Li vê çaxê kêmtir tiştek heye ku di biyavê zanistê xweriskî da qewimî bit û teşene nekiribit warê zanistên civakî. Eva xeleka girîng e.



Bismillahirrehmanirrehîm. Wela hewle wela quwete illa billah-il-eliyy-il-ezîm. We sallallahu ela seyydidina Muhemmedin we alihi ecmeîn.

Mirovê nû cudatiyên gewherî û binetarî digel mirovê berê peyda kirine û ev cudatiya bingehîn di warê cîhanbîniya mirovî û di warê kar û jiyara wî da xuya ye. Anku nihêrîna mirovî bo cîhanê û hêviyên wî û reftara wî ji hemî aliyan ve hatine guhartin; û her çende dunyaya me li ber çavan her ew dunya ye, ya mirovên berê lê di jiyan, lê di rastiyê da hinav û hundirê vê dunyayê tûşî guhartinên bingehîn bûye û ramaneka nû peyda kiriye. Evro ne aboriyê ramana xwe ya berê heye, ne exlaqî, ne dewletê, ne pare û diravî. Dê bibêjî qey amanên van têgeh û çemkan hatine valakirin û bi hindek tiştên dî hatine tijîkirin. Li vê derê dê bi kurtî behsê hindek ji van guhartinên giring kim:

Mirovê nû, berovajiyê mirovê berê, tenê bi tefsîr û şirovekirina cîhanê têr nabit; û xwe di vê cîhanê da bûnewerekî bêliv û eçeng (munfeil/pasîv) nabînit. Mirovê nû, mirovê destêwerder anku muteserif e. Ew şeklê heyî yê cîhanê napejirînit û baweriya wî ew e ku dibê heta dikarit di vê cîhanê da guhartinan çêbikit. Di çavên wî da çi tiştekî vebiriyayî (qetiyet peydakirî) û tekûz (kemlan) û neguhêrbar (ku ne mumkin bit bihêt guhartin) li vê cîhanê nîn e. Ji bo mirovê kevn hemî tiştên cîhanê tevdîrkirî, û li cihê xwe bûn. Mirovî jî nedikarî destêwerdanên kûr di vê cîhanê da kiriban û ne jî tiştekî hejî bû ku

www.arsivakurd.org



Her çende şahatî heta evro jî maye, lê tenê bi rûmetê maye, ne bi naverok. Li cîhana evro (berovajî yê berê) çi kesek ji bo sultanî cihekî xweriskî pênase nakit, lewma bi nêrîna mirovê evro sultaniyetî tiştekî ber bi nemanê ye.

weha kiriba, dûmahiya destêwerdanên wî tenê hindek guhartinên hûr di havilî û reftarên biçûk da bû. Baweriya wî ew bû ku hemî tiştan (di qada xweriskê da, û di warê civakê da) cihekî xweriskî heye û nedibû ku cihê xweriskî yê tiştan û bûyeran hatiba guhartin. Şubihandina civakê bi laşê mirovî, û wekandina sultanî bi serî û re'yetê jî bipêyan, û dîtina siyasetê wekî tebabet û pizişkiyê, hemî ji wê hizrê dihatin ku her ji bo her tiştekî cihekî xweriskî didît. Bi nihêrîna wî, saxlemî di danana her tiştekî li cihê xwe da bû. Feylesofan jî ji zû ve xelk fêrî wê kiribû ku ji bo mînakê dema tiştekî ji "cihê xweriskî" yê wî der bikin, ew tişt dixwazit dîsa li cihê xwe vebigerit û meşî û livîn ji vê dest pê dikit. Lewma, eger hemî tiştên cîhanê, li cihên xwe bin, çi livînek di cîhanê da naqewimit. "Heyîza xweriskî" li nik yên berê têgeheka gelek giring bû. Lê li cîhana evro ne di biyava xweriskê da çi cihên xweriskî ji bo tiştan dihên pênasekirin, ne jî di warê civak û aborî û siyasetê da. Evro ji bo mînak çi kesek nabêjit cihê agirî li jor e, lewma agir ber bi jor (goka etîrî) meylê dikit, an şahan di warê civakê da cihekî xweriskî heye.

Her çende şahatî heta evro jî maye, lê tenê bi rûmetê maye, ne bi naverok. Li cîhana evro (berovajî yê berê) çi kesek ji bo sultanî cihekî xweriskî pênase nakit, lewma bi nêrîna mirovê evro sultaniyetî tiştekî ber bi nemanê ye. Lê ji ber ku berê cihekî xweriskî ji bo wî dihat diyarkirin, sultaniyetî bê destêwerdan dima, her çende mumkin bû sultanekê sitemkar çûba û êkî adil hatiba cihê wî. Ev cudatî, ji bo mînak, di zanistê pizişkî da jî dihêt dîtin. Li dema me neştergerî (cerahî) gehiştiye gopîtkên gelek bilind û nema hindek endaman dibirit û didûrit, lê berhev e ku pergala laşê mirovî baştir û peyttir bikit; û nitil û xerîteya wî jî biguhêrit. Anku ne hema destêwerdanên pizişkî; lê destêwerdanên endazyaranî jî di laşî da dikit. Li gorî pizişkiya nû xulqet û afirandina mirovî ne wesa ye ku dibê baştirîn nitil û xerîteyan bit. Yên berê zêde zêde digot dibê nesaxî vegerînin rewşa wî ya xweriskî. Rewşa xweriskî nimûneya dawîn bû û "saxlemî" hema "xweriskîbûn" bû. Eger laşek ji rewşa xweriskî ya xwe derkeftiba nesax dihat hesibandin û erkê pizişkî bû ku dalengiyanî vebigerînit hevsengiyê; hema ev û bes. Lê li cîhana evro pizîşk û neşterkarî tenê ev nîn e. Vegerandina hevsengiyê dûmahî û tixûbê bizavên pizîşk û neşterkaran nîn e. Li nik pizîşk û neşterkarên evro tiştekê beraqil û pejirandî ye ku hindek ji endamên laşê mirovî wesa digel hinek endamên destkirî vebiguhêzin ku baştir karê xwe bikin; û ji evê heyî bi şiyantir, temendirêjtir û saxlemtir bibin. Xelkê evro qet nitil û rengê zikmak û Xwedêdayî yê laşî baştirîn nitil û reng nabînin. Ev hizir tenê di warê pizişkiyê da nîn e; li hemî deran hosa ye. Mirovê evro xwe wekî mirovekî neqayîl yê destêwerder di cîhanê da dibînit. Lê mirovê berê xwe wekî mêhvanekî didît ku di avahiyekê berîwextî avakirî da; bo ser sifreyeka amade hatiye vexwîndin. Ev cîhan mêhvanxaneyek bû ku cihê maneveya ku berkurt

www.arsivakurd.org



ya mirovî dihat hesibandin; û ji ber wê derav û mafê gazindkirina li xudanê malê nebû. Mirov bi "qismet"ê xwe razî bû û baweriya wî ew bû ku "rizqê me ji sifreya qederê her ev parî bû". Lê bi dû peydabûna zanist û cîhanbînî û mirovnasiya nû ra, ev rengê hizirîn û têgehiştinê hêdî hêdî hat vehêlan û hizrên destêwerderane û neraziyane li şûna wê rûniştin. Em li vê derê behsa qencî û neqenciya van bûyeran an dirustî û nedirustiya van hizran nakîn. Merema me tenê wesifandina van rûdan û bûyeran e. Bi her halê hebit, niha baweriya mirovê nû -qenc yan neqenc- ew e ku dibê cîhanê wesa ku wî divêt ava bikit û ne pêdivî ye ku wê wesa webigirit ku dane destê wî. Ji bo mirovê nû çi tiştek bi awayekê bivê-nevê sed li sedê pejirandî nîn e. Dem dema guhartinê ye ne şirovekirina petî (her wekî Marksî digot). Hindekan çemk û mefhûma "teqdîr"ê di cîhanbîniya kevn da beranberî mefhûm û çemka "cebr"ê dadina; ku helbet şaşiyek e. Ramana teqdîrê endazedarî û hevsengiya kar û barên cîhanê û qencbûna her tiştekî li cihê xwe û nerewayiya têkdana hevsengê ya wan e. Her ew tiştê ku Mewlanayî got:

Kêm fuzûliyê bike di hukmê qederê
Hejiyê hev hatine ker û guhê kerê

(Mesnewiya Me'newî, deftera sêyê, malika 2772ê)

An wekî Şêxê Şebisterî digot:

Cîhan wekî xet û xal û zulf û birhan e
Hemî tiştek li cihê xwe li cihan e

Bêguman, mirovekê xudanê vê hizrê dê havilêka nemazeyî û taybetî digel diyanetê jî hebit. Hizra dînî mirovên berê ber bi destêwerdanên bingehîn di pergal û nîzama cîhanê da û berxwerî û xweşiyên neraziyane pal nedidan; lê bi baweriya hindek ji hizreweran mirov ji karên wesa didan paş jî. Bi her awayî hebit, guman tê da nîn e ku eger zanîn û têgehiştina dînî ya mirovên berê ew ji destêwerdana di cîhanê da paşvendabin jî, ew han jî nedane. Exlaqzan zanayên dî yên berê qet negotiye ku ji bo mînak "ew mirov bextewartir û li nik Xwedê xweştivîtir û axîreta wî avedantir e ku destêwerdan û teserufeka zêdetir di vê cîhanê da bikit û xweşî û berxweriyên zêdetir bibînit; û guhartin û livînên zêdetir çêbikit." Exlaq û zanîna dînî mirovên dîndar ber xweşikandina di rasta afirandinê da paldidan û ji êk ji raman û pêdiviyên vê xweşikandinê jî ew bû ku mirov bi wî tiştê dane wî û bo wê hatibû muqederkirin qayîl û qani'bit û şukrê bikit; bi gotina dî rizqê xwe werbigirit û bi edalet bimezêxit û vebibeşit û rojên xwe bi aramî derbaz bikit.

www.arsivakurd.org

Lê mirovê nû li gorî cîhanbîniya nû ya ku vedîtî havilêka nû digel dînî peyda kiriye. Eger em evro di warê ramanê û kiryarê da neraêkê û lihevnegirtinê bûne, ji ber wê ye ku di kiryarê da em hêdî hêdî diçin nav çaxê nû da; belê hizrên me mil bi milê şêwazê jiyana me werar nekiriye. Têgehiştin û nêrîna piraniya me derheqa xwe û cîhana nû me ber bi destêwerdana ji van nêrînan vedixwînin. Qeleqî û aloziya me di warê kiryar û karî da zaroyê wê qeleqê û aloziya hizrî ye; lewma dibê êk ji her duwan bihêt guhartin.

Bi her hal, dijberiya mirovê nûdem (modern) û yê kevneşopî (teqlîdî, sunetî) tenê di babetê berxwerî (temetu') û destêwerdanê (teserufê) da nîn e û mirov dikarit vê lîsteyê hêşta dirêjtir bikit. Bi rengekê giştî mirovê nûdem

** mirovekê rexnegir û serhildêr e (beranberî mirovê aram û beremrê kevneşopî);*

- *daxwazkerê guhartina cîhanê (ne tenê daxwazkerê şirovekirina cîhanê);*
- *û daxwazkerê şoreşê (ne hema çêvekirinê) ye;*
- *kara û fe'al (ne karbar û munfe'il),*
- *razî bi guman û dudilî (ne daxwazkerê yeqînê),*
- *daxwazkerê zelalî û sebebzaniyê (ne heyret û nihîniyê),*
- *daxwazkerê betranî û kêfê (ne xema firaqê) ye,*
- *di hizra jiyanê da ye (ne di hizra mirinê da),*
- *daxwazkerê mafan e (ne hema erk û wacibân),*
- *xudanê hunerê afirîner e (ne hema zarvekirina xweriskî),*
- *berê wî li derve ye (ne hema li hundir),*
- *evîndarê dunyayê ye (ne hema berxwerê dunyayê ye),*
- *aqilî ji bo rexnegirtinê dixebitînit (ne hema ji bo têgehiştinê),*
- *û hayê wî benyatiyê nîn e û şehnaziyê bi afirîneriya xwe dikit û hayê wî ji afirandîbûna xwe nîn e.*



Sekularîzm an dînîkirina hukimetan li dema nû bi du sedem û meremên cuda peyda bû. Anku feylesof û hizirvanên ku daxwaza hukimeta nedînî dikir du meremên cuda hebûn.

Lewma berovajiyê Mewlanayî ye ku digot:

Em xwe afirandî ne, ne afirîner

Em şkestî ne, em pejirîner

Me ev tişt wekî destpêk gotin da şirovekirina pirsgirêka sekularîzmê sanahîtir û havilê wê bi babetê dîndariyê ra aşkeratir bibit.

Li dema nû sekularîzm bi ramana ladana hişyarane agehdarane ya dînî ji qada jiyarê û siyasetê dihêt ravekirin. Hukimeta sekular hukimetek e, ku dujminiya dînî nakit; lê dînî nakit bingehê rewayî û meşrû'iyeta xwe û karê xwe. Her hukimetek ji bo damezrandin û mana xwe hewcedara du tiştan e:

- *Bingehek ku meşrû'iyet û rewayiya wê bi cih bikit;*
- *û bingehê duyê jî, ew e yê ku dibê li goreyî wî kar bikit û li goreyî wî destêwerdanan bikit û siyasetan dabirêjit.*

www.arsivakurdi.org

Demek bû, ku hukimetan ev her du ji dînan wergirtin. Anku desthilatdar û hakim hîngê mafdar dibû, ku bi piştevaniya dînekî li ser textê desthilatê rûniştiba û reftara wî jî li goreyî exlaqê dînî û şerîet û hukmê dînî ba. Lê li zemanê me (dused sêsed salên borî û hêr ve) ev hizir bi tevavî vehêlayî maye. Evro hukimet bi piştevaniya dengên xelkê dihên pejirandin û rewayiyê werdigirin; û karê wan jî ew qanûn diyar û sînordar dikin ku xelkê bi xwe darijtine.

Sekularîzm an dînîkirina hukimetan li dema nû bi du sedem û meremên cuda peyda bû. Anku feylesof û hizirvanên ku daxwaza hukimeta nedînî dikir du meremên cuda hebûn. Desteyek ji wan dîn betal û pûç dihesiband û hatina hizreka pûç û betal bo warê siyasetê wêranker, zererbar didît û desteka duyê dîn heq û rast didît; lê nedipejirand ku dînê heq bi nepakijî û berjewendîparêzên siyasetê bihêt pîskirin; an tiştekê pîroz bikevit xizmeta karên dunyayê û nepîroz. Bi her awayî hebit, hizra sekularîzmê dîn ji qada hukimetê derkir û mafê damezrandina hukimetê, danana qanûnan da destê mirovan.

Lê hatina sekularîzmê du sedemên nêzîk hebûn:

- *Êk, serhildana hizra zanistî ya ji aqilbawerî û eqlaniyeta nû peyda dibû,*
- *û ya dî, guhartin û werareka kûr bû, ku di têgeh û haviliya navbera maf û erkan da li cîhana nû peyda bibû.*

Niha dê bizavê bikim van her du sedeman bi dirêjî ruhn bikim.

Bi baweriya min, em qet nekarîn dîroka nû ya mirovî bi dirustî şirove bikîn. Eger em bi dirustî zanîna nû ya ku mirovî peydakirî şirove nekîn. Mirov her zanîn e. Bi gotina Mewlanayî, ruhê me tenê agehî ye û em çend agehdartir bin, ewqas mirovtir û ruhdartir dibîn:

Can nî ye tiştek ji agehê pitir
Her kesê ageh pitir ruh zêdetir

Canê me ji canê dirindan pirtir e
Lew ku me ageh ji wan pir pirtir e

(Mesnewiya Mesnewî, deftera duyê, malikên 3326 û 3327ê)

Vêca, eger em bixwazîn dîroka mirovî bi kurtî şirove bikîn, dibê em binêrîn ka çi bi serê zanayiya wî hatiye. Bi rastî eger ev zanîna zanistî ya nû û bingehên jorxweriskî (mabe'dutebi'î) yên wî ji bo mirovî dest nedaba, mirov dê her mirovê berê bûya. Lewma, bi xwe sedema duyê ya sekularîzmê (anku derbazbûna ji erk û waciban ber bi mafan) jî êk zaroyên zanayiya nû ye. Vê zanîna zanistî ya nû ne hema wêneyê cîhanê di çavên mirovî da guhartiye. Têgehiştina nû ji mirovî û hêzeka nû ji bo destêwerdana di cîhanê da jî daye wî. Ji ber vê, tiştekê mîna wê guhartina ku di warê niyasîn û bindestkirina xweriskê da peyda bû; guhartinek jî di warê mirovnasiyê, zanistên civakî, aboriyê û siyasetê da jî qewimî. Ev guhartin girêdayiya peydabûna hizra zanistî bû. Û sekularîzm ji zanistandin (zanistîkirin, 'ewleme) aqilmendina (aqilmendkirina) rêveberina civakî pêvetir tiştek nîn e.

Hindek kesan di erebiyê da sekularîzm kiriye "'elmaniye". Ramana vê peyvê hêşta ji bo hindek xelkê şêlî ye. Ji bo mînak, rehmetî Muteherî li cihekî nivîsiye "elmaniyet" her çende wekî peyvên erebî ye; lê di nav peyvên erebî da me çi nîşanên wê nedîtine" (Muteherî, Murteza; Tefkîrên Îslamî Di Sedsalên Çûyî Da; Weşanên Sedra b.p. 25ê). Ramana peyva "'elmaniyet"ê "ilmîkirin" anku zanistandin e (yan jî alemîkirin anku cîhanîkirin). Nivîserên nû yên ereb dema dixwazin bibêjin "îslamîkirin" dibêjin "eslemet'ul-ulum'il-însaniyye", anku "îslamîkirina zanistên mirovî". Her li dû vê

www.arsivakurdi.org

selîqeyê dihêt gotin "'elmenet'ul-îctima'" anku "zanistîkirina civakê". Her wekî ku di erebiya nû da 'eqlene" bi ramana eqlanîkirinê anku aqilmendkirinê ye. Û 'esrene bi ramana esrîkirin û hevdemkirinê ye.

Mirov dikarit bibêjit "'elmaniyet" bi ramana "zanistandin (zanistîkirin) an zanistîn (zanistîbûnê)" dicihêxwedatirîn paçve anku wergêrana sekularîzmê ye. Helbet wekî berî niha jî amaje pê da, di sekularîzmê da nedînîtî yan behsnekirin û pûtepênekirina bi dînî jî heye; û her wekî me got, dema em dibêjin hukimetek sekular e bi wê ramanê ye ku ew hukimet rewayî û meşrû'iyeta ji dînî wernagirit û qanûnên kiryarekî yên wî jî ji dînî nahên. Ev dirust e; lê çima hukimet rewabûna xwe ji dînî wernagirit? Û çima ji bo danana qanûnên kiryarekî, xwe hewcedara şerîetê nabînit? Bersiva vê pirsiyarê di aliyê dî yê sekularîzmê da ye: Anku di rêvebirina zanistî ya civakê û siyasetê da.

Rêvebirina zanistî ya civakê û siyasetê hevkûfî wê bûyerê ye, ku di warê xweriskê da qewimiye. Li vê çaxê kêmtir tiştek heye ku di biyavê zanistê xweriskî da qewimî bit û teşene nekiribit warê zanistên civakî. Eva xeleka girîng e. Zanînê wesa desthelata xwe bi ser cîhanê da belav kiriye, ku çi vavartû îstisnayekê naniyasit. Girîmane anku fereza êkê ya zanînzanistvanan (epîstemolojîstan) û zanistvanan ew e, ku dema amrazekê kêra bi dest ve diînin, hindî dikarin ji wî amrazî mifayê dibînin. Bihurîna bi sedan salan bû sedema wê ku wêneyê metafîzîkî-felsefî yê mirovan ji cîhanê bihêt guhartin, paşî vê guhartinê bû warê civakî û rewanê (nefsiyeta) mirovî jî teşene kir û wêneyê metafîzîkî-felsefî yê mirovan ji civakî û aboriyê hat guhartin. Çênabit xwerisknasiya zanayan feylesofanî û metafîzîkî bit, û şêwazê karkirin û rêvebiriya wan di warê civakê da zanistî û tecrîbî (anku metafîzîkî) bit, û bervajiyê vê jî wesa ye. Debar û rêvebirina zanistî ya civakê û destêwerdanên tecrîbî-zanistî di pirsgirêkên siyasî û exlaqî da hîngê mumkin û ramandar (me'nadar) bû û amrazên wê berhev bûn ku pêştir ew kar di warê xweriskê da nêrîna zanistî ya nû cihê nêrîna metafîzîkî-felsefî girt û zanistvanan li şûna sedemên dûr (el-ilel'ul-beîde) destê xwe dirêj kir sedemên nêzîk (el-ilel'ul-qerîbe) û li şûna "çima"yê pirsiyara "çawayî"ya buyeran kir û li "bandorên tebian" (asar'ut-tabaî') li "qanûnên xweriskê geriyan û qesr li şûna tebeî dana û guman li şûna yeqînê, aha hîngê civak jî ji rewşa xwe ya pir ji nihêniyan û razan derhat û xwe sparte şûr anku kêra tecrîbeyê û babetekê zanistî û serxwebûneke hejiyê peyda kir û lêkolîn li "qanûnên" wê jî hat kirin. Anku ew dem nema ku mirovî hemî tişt bi saloxetên nepenî û veşartî ve girêdidan û ew dem çû ku mirov hizir bikit nikarit ji nihênî û razên wê têbigehit. Û ew pîrozî, saf û heybeta ku di diyareyan de didît nema. Xweriska ku heta hîngê bi awayekê giştî warê nihêniyên keşifnebûyî bû ku dê qet nehatiban keşifkirin, kirasê nihênîbarî û raznakî ya xwe havêt û êdî tebianî nema û bu tiştekî qesrî. Feylesofên berê di rû bi rûbûna digel xweriskê da dalxeya vedîtina mahiyet û nêçîrkirina tebian lê dida. Li nik wan zanist ji vedîtina mahiyetan pêvetir tiştek nebû. Lê dema zanayan dest ji mahiyetan û wêneyên gewherî û saloxetên nepenî berda û waz ji wê nêrîna felsefî-metafîzîkî-yeqînî îna û xema xwe kir lêkolîna qanûnên gumanbariyên şûnewarên berçav û qesrî yên tiştan, zanistê xweriskî bû tiştekî mumkin bi dû ra, destêwerdanên zanistî qada xweriskê da jî bi lezgînî mumkin bûn û teknolojî ji dayik bû. (Min behsa dirêj ya vê babetê destpêka kitêba B*inemayên Jorxweriskî (mabe'd'ut-tebî'î) Yên Zanistên Nû,* (Weşanên Zanistî Û Ferhengî, salên 1369ê, 1374ê) da înaye li wê jêderê vebigere.

www.arsivakurd.org

Feqiyê Teyran

Îro ji dest husna hebîb sergeşte û heyran im ez
Min eşq û muhbet bûn nesîb sewadê sergerdan im ez

Eşqê gelek sewda kirin bê mal û bê mewda kirin
Nûra çira winda kirin Mûsayê Imran im ez

Mûsa ji dest husna bi nûr şêrîniya xalên di hûr
Secde bire ber Kohê Tûr nêzîkî remzê wan im ez

Remzê ku dê dilber bikin carek bi çeşman seyr bikin
Dê Kohê Qaf ker ker bikin mecrûhê pir-kovan im ez

Min ah ji dest kovan û qehran min sebr nayêt li sehran
Şubhetê mewcên di behran qulzemê umman im ez

Qulzem û behrên di heftê agirê eşqe ku keftê
Dê bisojit şubhê neftê min diye, pê zanim ez

Min diye muhbet çi reng e sohtime doja pir-ye'ke
Min mudam dil jê biheng e bi nalîn û efxan im ez

Nalîna teyr û tuyûran kalîna çeng û bilûran
Xulxulên di qesr û qusûran bulbulê xoşxan im ez

Bulbul im daîm dixwînim ez yeqîn ez te bibînim
Dîn dibim sewda dimînim serxoş û sukran im ez

Serxoş û ebter kirim te ji illeta rengzer kirim
Te sotim û ker ker kirim tu agir î buryan im ez

www.arsivakurd.org

Bingeha baweriya me Quran

YAKUP ASLAN

Ji ber ku gelek neheqî û zulim li ser zimanê Kurdî çebûye, bi rastî mirov nizanit ka çawa merama dilê xwe bi rehetî bînite ziman. Kêmasiyeki din jî ew e ku sed heyf û mixabin em ewil bi zimanê Tirkî hizir diken û paşê em di zêhna xwe da ewê tercumeyî Kurdî diken... Em hêvîdar in ku ev hêdî hêdî kêm bibe û em karibin zêdetir bi Kurdî bifikirin.

Em dixwazin di vê nivîsê de li ser Quranê bisekinin. Gelo, me'na Quranê çi ye? Em çi jê fam diken? Navbeyna me çawa ne? Di hizr û ramanên me de yan jî di jiyana me de çend cih digirit? Yan jî çi qasî rengê xwe didete jiyanê? Hizr û ramanên me, çalakiyen me, adet û rusûmên me çend poştivaniyê jê digirit? Bûyer û qewimînên rojane em ji binara wê dibînin, ya gava şolek diqewimit em rusûmên beşerî yên xwe bi emel tînin? Hewe jî gelek caran dîtiye, gava bûyerek dibit em bi serê xwe qeraran digirin û emel diken. Piştî ku xebata me digihê dawî, vêca em bi sed curan li dû delîl û sebeban digerin. Yanî hingê em muhtacî senedên dîndariyê dibin. Bingeha ku herî bihêz e bêguman Quran e. Ew bingeh hem xebata me û hem jî me bi siyanet, qedr û qîmet ditêxit... Bingeha ku ji ewil nehatiye bîra me, piştî bûyerê bo me dibite penahgah. Bawerî, qaîde, eqîde û hizra me çend bi Quranê ve girêdayî ne? Li civatan, di nav xebetan de, li mal, li gel hevalan em çend bi hukm û gotinên wê diemilin? Ewil em hizra xwe li ser Qurana pîroz pêk tînin û paşê em diemilin, yan jî em diemilin û paşê em di zivirîne Quranê û meşrûiyeta emelên xwe bi wê ve girêdiden?

Metelokek heye... Dibêjin kalek di rexê çemekî re derbas dibe, diçite gundekî. Têtе rex gereke mezin. Dûre goleke mezin dibînît û di avê de hin masî hene ku cih nîne bilivin. Dikeve heyretê, dibêjit: "Gelo ma çu kes li van dor û beran nîne ku neçîra masiyan biket?" Qederekê diçit. Rêka wî her li rex çemî bûye. Paşî bêhneke dirêj çend mirovan dibînit. Li dor rexên gereke biçûk ew mirovên boş, bi şer û gengeşî masiyan digirin. Nêzîkî gerê dibit, dibînit ku li gerê 5-6 masî tenê hene û ew koma mirovan bi şer û gengeşe bi nêçîra masiyan ve mijûl in. Dikeve heyretê. Bo wan tiştinan dibêjit, lê ew hind di nav şer û qêrîna xwe de berze bûne ku hay ji dengê wî nabin. Ya rastî hin ji xwe bawer in û qure ne ku qîmetê nadin gotina pîremêrî.

Gava mirov bê penah û bingeh bin, dê halê wan mîna mirovên ku me di metelokê de behs kir be...

Têkiliya me bi dor û berê me re, exlaqê me yê jiyana rojane, têgihîştina me der heqê rewişta beşerî de, hizra me ya li ser Nebî, mezheban, civak, werziş, aşîtî, kedxwarî, peyman, ilm, huner, perwerdehî, siyaset, aborî, teknolojî, bajarvanî, koçberî, dîrok, edebiyat û milletperwerî ji hizra Quranê reng digirit an ji zeafiyetên beşerî rengê xwe

www.arsivakurd.org

digirin? Çendan ji me, Quran ji serî heta dumahiyê fam kiriye û xwandiye?

Bi rastî ez bawer nakem ku ewên gelek caran bi navê Quranê xeber didin, ew peyama ku ji Xwedê hatiye xwendibin. Em gava bi kêrî gotina me bêtin dixwînin. Ji bona xwandinê, ne pêwist e ku em nizanim çend salan biçine medresan û nîvê emrê xwo li wê derê derbas bikin da ku em zimanê Erebî fêr bibin. Her şol sanahî bûye. Em dikarin Quranê ji tercuma wê bixwînin. Her çiqasî gelek xeletî di tercumeyan de hebe jî, heke em bi eşq û dil bixebitin em dişên peyama ku jî Xwedê bo me hatiye bi sanahî fam biken. Tercuma Quranê, bi xwe binetara peyamê nîne. Belê hema bi vî şiklî bo me şibakeyeke wisa mezin vediket ku em li gerekî biçûk li du-sê masiyan negerihin û em biçine bingeha masiyên ku li gera mezin heye...

Em Misilman pêwist e hizr û fikrên xwe ji Quranê perwerde biken. Ewil vekolîneke binecih biken, paşê bawerî, hizr û emelên me rengê vê vekolînê bigirin. Gava me baweriya xwe li ser vê rêkê ava kir, me peyama Xwedê rast zaniye û di jiyana xwe de behra pirtirê daye wê. Heke em bi vi şiklî baweriya xwe bêjîng neken û em li ser hizir, fikir, rusûmên bab û bapîran bin, bi rastî em hem neheqiyê li xwe diken û hem jî li peyama îlahî diken. Roja qiyametê bab û bapîr, berpirsên baweriya me nabin. Bingehê baweriyê ewil Quran e, paşê rêk, ceribandin û hizrê beşerî têtin.

Ger em baweriya xwe ji dîndariya hizr û baweriyên kevnare xelas nekin, baweriya rast û ya li ser esasê Quranê peyda nabit. Di dîndariya kevn de behra pirtir rengê sultanan, baweriyên çewt û têgihîştinên şaş zêdetir in. Quran, bawermendiya li ser şopa bab û kalan rexne diket. Peyama îlahî her ferdî ji fahmkirin û bawerîya bi dîn, bi serê xwe mesûl dibînit. Ango her kes ji xwe berpirs e. Çu kes bi bawerî û hizrên yekî dîn, neşêt bingeha baweriya xwe pêk bînît... Gava mirov baweriya xwe li ser bingeha Quranê çêbiket, jiyana wê dê li nav xîmen dînî şiklê xwe bigire. Hezar û pênsed sal e ku yên Quran bo xwe kiribin rêber, ji baweriyen kevneperestî, xurafat, xeletî û şaşîyan dûr ketine û nêzîkî rêka rast bûne. Bi hezaran mînak di dîroka însaniyetê de hene. Elî Şerîatî yek ji wan e. Di dawiya vê nîvîsa xwe de em bi duayekî wî vê nivîsa xwe xilas biken...

Ey Xwedayê mezin,

Tu kûrfikrînê nesîbî seyda û melayên me bike. Zanînê bide gelê me, dîndariyê bide dîndarên me. Bi mumînan ruşenayî, bi rewşenfikranên û nivîskarên me îman, bi muetessibanên me famkirin, bi exlaksivikên me giranî, bi jinên me fêmkirina zihnî û bi zelamên me şerefê nesîb bike.

Tu bi meznahiya xwe, bi pîremerdên me dûrbînahî û bi tolazên me qedr û siyanetê nesîb bike. Bi mamosta û melayên me bawermendî û bi feqî û xwendekarên me jî eqîdeyeke Îslamî bide. Tu bi qudreta xwe, bi nivîstiyên me hişyarî; bi hişyarên me îrade, bi parêzkarên me hereketê, bi rûniştiyên me serbilindiyê nesîb bike. Bi bêdengên me feryadê/hewarê, bi nîvîskarên me piştrastbûnê bike nesîb... Bu hunermendên me derd, bi şairên me şiûr.. Bi lêkolerên me armanc, bi mubellixanên me heqîqet, bi hesûdanên me sibhetê, bi exlaqsivikên me edebê bike nesîb.. Bi cemaet, firqe û civatên me yekîtiyê nesîb bike. Tu bi qudret û mezinahiya xwe, bi gêlê me şiyarbûn, dilgermî, parastin, hesiyan, pêhesîn, xweşdîtin û çakbînê nesîb bike. Bi izzet û qudreta xwe, serkeftin, azadî û serfiraziyê nesîbî gelê me bike...

www.arsivakurd.org

Ehmedê Xanî

Fate umrî fî hewak ya hebîbî kullî hal
Ah û nalem hemdemem şod der firaqet mah û sal
Ger benim kanım dilersen çokdan olmuşdur helal
Dîn û ebter bûm ji eşqê min nema eql û kemal

Ente fikrî fî fuadî ente rûhî fî1-cesed
Leşkerê xemhayê to molkê dilem wêranî kerd
Dade geldim aşk elinden isterim senden meded
Wan Tetaran birne yexma eql û dîn û milk û mal

Tale xemmî zade hemmî şa'e sirrî fî1-Mela
Teşneyê camê visal em çon şehîdê Kerbela
Yoksa sen diwane oldun nice halim ey dîla
Ya ji nû ve îşweyek da min hebîba çavxezal

Bûtte hicranen hebîbî leşte mînnî alimen
Her dem ez derdî firaqet xafilî ez halê men
Can û dilden arzi kıldım halimi canana ben
Erzûhala min tu xafil qet nepirsî erzê hal

Hel lena min nîmetî wesl el-hebîbî min nesîb
Oftadem ber deret bîçare sergerdanê xerîb
Derdimiz çok lek senden ona yok hiçbir tabib
Ey tebîbê min dewayê derdê Xanî her wîsal1

---

1 Rîwayetek hatiye Huseynê Kerbela. Min hunraweke (şiîreke) dîtir a Xanî dîtiye, diwahiya wê ev e:
"Ger nedanem rûzî mehşer ku dibînim dilberê
Dê çi lê kem Cinnetê pe wer bikem xagusterî"

www.arsivakurdi.org

Şîretên Hekîmê Loqman

OSMAN ÎZOL



Şîret wekî hilma jiyan û rojê ye. Ji zarokatiyê heta mirinê hogirê kuw berê mirovan dide rindiyê û di nava jiyanê de li ser lingan dihêle şîret e. Şîret perdeya cehaletê diqelişîne û ewleyiyê dide mirovan. Şîret hogir e, hogirê ku dem bi dem bi mirovan re ye. Ma Qur'ana pîroz û kitêbên din yên semawî bi piranî ne şîret in?

Însan her çi qas zana be jî, pêdiviya wî bi şîretan heye. Çimkî şîret, di dan û sitendinê de, di rabûn û rûniştandinê de, di xwarin û vexwarinê de û di her cure kirinan de dikare helwesteke resen, însanî, exlaqî û xwerû bide mirovan. Çimkî şîret, (yên ku zanibin, ji bo wan) di nava xwe de hêzekê dihewîne.

Di dîrokê de pêxember û zanayên mezin, hemû bi şîretên balkêş têne naskirin. Jixwe hemû resûlên Xwedê, bi wehyê ve ji gelan re hatine şandin. Ji bilî wehyê jî kirin û gotinê wan hemû mînak in ji bo mirovan.

Ev mijara me jî li ser şîretên mirovekî ku mînak e û bi şîretên xwe jî di Qur'ana pîroz de hatiye medhkirin, Hekîmê Loqman e. Li gorî hin agahiyan Hekîmê Loqman pêxemberek ji wan pêxemberên Xwedê ye. Lê agahî bi piranî li ser wê yekê ne ku evdekî salih e. Çimkî di Qur'anê de, li ser pêxemberbûna wî tu delîlên rasterast nîn in. Li gorî çavkaniyan hevçaxê Dawud pêxember e. Li Ûmmana Erebîstanê jiyaye. Bi Dawud pêxember re ketiye têkiliyê û ji wî fêrî ilmê bûye.

Der heqê jiyana Hekîmê Loqman de agahiyên ku îro di destê me de ne, bi temamî ne rast in. Ji ber vê yekê divê em di nava van agahiyên curbecur de xwe nefetisînin. Divê em wateya ku Xwedayê mezin dixwaze em ji xwe re bigirin û bi taybetî jî li ser wan bisekinin.

www.arsivakurd.org

Hekîmê Loman şexsiyetek mînak bû. Di Qur'ana pîroz de, sûreyek bi navê wî heye. Xwedê der heqê wî de wiha dibêje:



- Sond be, ji bo ku şikir bike, me hîkmet da Loqman (Loqman, 12).
- Ji vê yekê jî dixuye ku Loqman xwedî hîkmet bû, di gotinên wî de hîkmet û şîret hebûn. Li gorî mufessiran vê hîkmeta ku ji Hekîmê Loqman re hatiye dayîn, tê wateya eql, hişmendî, ilm û biryarên rast. Jixwe kîjan kes xwediyê van wesfan be, ji ziman û kirinên wî, ji mirovahiyê re ji rindiyê pê ve tu tişt nîn e.
- Hekîmê Loqman bavekî mînak bû. Muhebbeta ku di navbera wî û lawê wî de derbas dibe, di nava hemû mirovahiyê de meşhûr e. Vê yekê Qur'ana pîroz û zelal wisa ji me re dibêje:
- Loqman ji lawê xwe re şîretan kir û got: Lawê min ji Xwedê re şirîk nebine, bêguman şîrk bi rastî jî zilmek herî mezin e (Loqman, 13).
- Di ayetekî din de jî ji bo tebat û ezmê, Loqman ji lawê xwe re wiha dibêje:
- Lawê min, nimêja xwe rasterast bike. Qenciyê emr bike û ji çewtiyê dûrxîne. Li hember tiştên ku di serê te de derbas bûne, sebir bike. Çimkî wan xebatên ku ezmê dixawzin ev in (Loqman, 17).
- Di van ayetan de ji bo mirovahiyê mînakên giranbuha hene. Hekîmê Loqman dizanîbû ku şîrk, kesan dike xulamê nefsê û ji sedema afirandina wî/ê dûr dixe. Yên ku ji sedema afirandina xwe dûr ketine, ji bilî Xwedê, bûne bendeyên hemû tiştan. Êdî li ser kirinên kesên wisa, wan tiştên ku ji jê re bendetiyê dikin, xwedî bandorin. Kesên wisa xwe ji her tiştî mezintir dibînin. Ji ber ku dixwazin di vê dinê de bibin xwediyê hemû tiştan, her cure kirinan ji xwe re meşrû dibînin. Dema ku ev yek bibe nexweşiyek civatî (jixwe pirî caran wisa bûye), jiyan diherime, tu wateya jiyanê namîne, xweperestî dibe qiblegeha mirovan û mirovahî berê xwe winda dike.
- Wisa dixuye ku Hekîmê Loqman bi vê yekê jî dizanibû ku ji lawê xwe re wiha got:
- Ji tu însanî rû banede û li ser rûyê erdê bi quretî nemeşe. Çimkî Xwedê, yên ku xwe mezintir dibînin û xwe qure dikin, ji wan heznake (Loqman, 18).
- Ji bo mirovahiyê jiyan azmûn e. Di vê azmûnê de yên ku pişta xwe bidin Xwedayê ezîm tu carî winda nakin, lê dema ku însan di kirinên xwe de ji şeytan re parekî bihêlin û hewl bidin ku şeytan jî hevalê wan be, wê demê dê azmûna xwe winda bikin û dê li ber Xwedayê ezîm asê bibin.

www.arsivakurd.org



Însan û Jiyan

Mele Emînê Botikî

Însan, mexlûqekî pir bi qîmet e. Lewra Xwedê teala di Qur'ana pîroz de wiha ferman dike: "Bêguman me zaroyên Adem (însan) bi qîmet kiriye."[1] Dema ku em li ser gerdûnê (kaînatê) bifikirin, em dibînin ku pirên mexlûqan xizmeta însan dikin. Roj, hîv,stêrk, ewr, baran, giya, çiya, derya, ba û gişên madenan di xizmeta însan de ne û yadîgarên Xwedê ne. Lewra di Qur'ana pîroz de wiha hatiye fermankirin: "Yê ku ji ezmana avê dibarîne ew e. Di wê de ji we re av vexwarin heye û ji bo çêrandina haywanên we jî çêre heye. (Xwedê) Bi saya avê, ji we re zadan, zeytûnan, xurman û gişên fêkiyan çêdike. Wî; şev, ronî, roj û hîv kiriye bin xizmeta we de."[2]

Di vê xisûsê de pir ayet hene. Lê belê pirên însana ev hikmet fêm nekirine. Ji bo vî qasî divê ku însan xwe nas bike û sedema afirandina xwe bizanibe. Însan ne ji bo ku bixwe, vexwe û li gorî kêf û zewqên xwe bijî hatiye çêkirin, belkî ji bo ku bi rastî îbadeta Xwedê bike û di xebat û exlaqê xwe de, Xwedê temsîl bike hatiye çêkirin. Lewra Xwedê teala wiha ferman dike: "Tenê ji bo ku ji min re îbadetê bikin min ins û cin afirandine. Ez ji wan rizq û xwarindanê naxwazim."[3]

Lê belê dema ku em li dîroka însanan dinêrin, em dibînin ku pirên însanan ev hikmet nas nekirine û ketine şirk û kufrê. Lewra hebûna Xwedê û çêkirina gerdûnê (kaînatê) hewaleyî eqlê xwe dikin. Eqil jî rastiyê bi temamî fêm nake. Ji bo vî qasî, Xwedê teala pêxember şandine. Pêxemberan jî dîn û baweriya rast ji xelkê re gotine. Yên ku bawerî bi van pêxemberan anîne,

www.arsivakurdi.org

ji bo ku piştî mirinê jiyaneke xweştir û bêdawî derbas bikin, bi hinek tengasî û zextên dinyayê razî bûne. Lewra Xwedê wiha ferman kiriye: "Ma ew zextên ku hatine serê wan (qewmên) beriya we ku neyêne serê we, hûn bi guman in ku hûn herine bihuştê?"[4] Lewra fêm kirine ku ev dinya ciyê îmtihanê ye û timê însanan wê bimirin. Piştî mirinê wê careke din sax bibin, kesên li dû pêxemberan çûbe, wê here bihuştê, kesê ku li dijî wan rabûbe, wê here dojehê. Di bihuştê de kalbûnî, nexweşî , xizanî, mirin, şer, hesûdî û tiştên ku însan jê direvin tunin. Di dojehê de jî, jiyana di nav agir de heye, av, edab û xwîna kelî berdidine devê wan heta ku rûviyên wan dihelin. Çi qas ku çermê wan dişewite dîsa şîn dibe.[5]

Di jiyana axiretê de mirin tuneye ku ji wî ezabî xelas bibin. Heger baweriyeke li gorî Qur'anê tüne be, wê ebedî di vî halî de bidomin. Ji bo ku jiyan û helwesteke bi vî terzî û di vê baweriyê de were bikaranîn, Xwedê teala sed û bîst û çar hezar pêxember şandine. Gişên van pêxemberan gotine ku axireta xwe bi dinyayê neguherînin. Lewra hûnê zerareke mezin bibînin. Pêxemberê me (s.) wiha dibêje: "Heger li nik Xwedê giraniya dinyayê bi qasî perekî pêşiyê hebûna, ji vê dinyayê qurtek av jî nedida kesên kafir."[6]

Ji bo vî qasî gişê pêxemberan û kesên ku bi rastî bawerî bi van pêxemberan anîne, jiyana xwe li gorî pîvanê Xwedê teala rast kirine û bi zewqên dinyayê nehatine xapandin. Lewra wan fermana Xwedê rind fêm kirine: "Bila jiyana dinyayê we nexapîne û bila Şeytan jî bi Xwedê we nexapîne."[7] Pêxember jî wiha dibêje: "Heger tiştê ku ez dizanim we zaniba, hûnê hindik bikeniyana û pir bigiriyana."[8]

Ji bo vî qasî lazim e ku însan tiştên dînî hewaleyî eqlê xwe neke û li gorî pîvanên wehya Xwedê teala bimeşe. Xwedê teala bawerî û jiyana Îslamê çawa ji me re daye zanîn, lazim e ku em bi wî terzî bimeşin. Xwedê teala tiştên ku zerarê didine însanan qedexe kirine. Ew jî tiştên wekî eraqê, qumarê, fayizê, diziyê, zînayê, tazî derketina jinan, kuştina bêheqî, nîjadparêzî, seb, xêrnexwazî û bêîbadetî ne. Lê belê dema ku em li erdnîgara Misilmanan dinêrin, ev tiştên ku me li jor nivîsandine pirê wan hene. Şûna ku Qu'ran û Pêxember ji xwe re bikin mînak, Ewrûpayî , zordest û nîjadperestan ji xwe re dikine mînak û rêveber. Lê belê Xwedê teala jî di Qur'anê de wiha ferman dike: "Hûn giş xwe bi benikê (Qur'ana) Xwedê bigirin û ji hev belav nebin."[9]

Ji bo ku Misilman ji dînê dûr bûne, perîşan û bêçare mane, ji hev belav bûne, hêz û qiraniya



www.arsivakurd.org

wan nemaye. Bûne dûvik ji emperyalîstan re. Emperyalîst jî, çekên xwe difiroşin wan û wan berdidine hev. Exlaqê xwe yê dijî Îslamê di nav wan de bicih dike. Hesasiyetên namûsê ji nav wan radike. Îznê nade ku bi hukmê Qur'anê emel bikin. Pêxember (s.) ji bo ku Misilman nekevine vê xeletiyê beriya hezar û çarsed salî ew hişyar kirine û wiha gotiye: "Hûnê bost bi bost, çeng bi çeng bibine tabiê rêçikên kesên beriya xwe. Ku ew herine kuna gumgumokê jî hûnê dîsa li dû wan herin. Sehabe dibêjin me got ma ew Xiristiyan û Cihû ne? Pêxember bersiv da û got: Ma ji xeynî wan kî hene?

Ev nêzî sed sal e ziman û netewa Kurdan hatiye qedexekirin. Hal ev e ku Xwedê teala di sûreyê Rûm ayeta 22an de hebûna qewman wek ayetekê dide nîşandan. Ji bo vî qasî bi milyonan însan hatine kuştin û hê jî têne kuştin. Misilmanan maneya "umetê" fêm nekirine. Tetbîqa wê bi navê federasyonê ye. Di vê federasyonê de nemaze ku Kurd jî di nav de bicih bibin, gişê qewman bi nasname xwe wê cih bigirin. Li dijî dinyayê wê yek dewlet bin. Lê belê di nav xwe de her qewm, bi navê îdareya herêmî wê rêveberên xwe hilbijêrin û xwe îdare bikin. Dema ku ev çêbibe, Misilman qet ji hev belav nabin. Lewra her kes wekî hev e. Heger Emewiyan, Ebasiyan û Osmaniyan ev kiribana, qet ji hev belav nedibûn.

Dema em bixwazin ku ji Misilmanan re jiyaneke rast fêm bikin, pêwist e ku em van tiştan rind bizanibin û em di gişê axaftin, helwest û nivîsandinên xwe de li razîkirina Xwedê teala bigerin û gavên xwe bi navê Xwedê teala bavêjin. Pêwist e kesê ku bêje ez Misilman im, terka kevneşopiyên bav û bapîran bike. Lewra dema ku em li Qur'anê dinêrin, em dibînin ku ew qewmên li dijî pêxemberan radibûn û şirk diparastin, tenê ji bo girêdana bi kevneşopiyên xwe re ev tişt dikirin. Lewra Xwedê teala di Qur'anê de wiha ferman dike: "Dema ji wan re dihate gotin ku bibine tabiê tiştên ku Xwedê şandiye, gotin na! Emê bibine tabiê wê rêya (kevneşopiyên) ku me bav û bapîrên xwe li ser dîtine."[10]

Xwedê teala arîkar be!

JÊRENOT

1 (Îsra:70).
2 (Nehl: 10-12).
3 (Zariyat: 56-57).
4 (Beqere: 214).
5 (Hec:19, Nîsa:56).
6 (Tirmizî).
7 (Loqman: 33).
8 (Buxarî).
9 (Alî Îmran:103).
10 (Beqere: 170).



www.arsivakurd.org



Îman-Bawerî di Însan de Fitrî ye

M. Reşîdê Hiritî

www.arsivakurd.org

عَنْ أَبِي هُرَيْرَةَ قَالَ
قَالَ رَسُولُ اللَّهِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ كُلُّ مَوْلُودٍ يُولَدُ عَلَى الْفِطْرَةِ فَأَبَوَاهُ يُهَوِّدَانِهِ وَيُنَصِّرَانِهِ وَيُمَجِّسَانِهِ كَمَا تُنْتَجُ الْبَهِيمَةُ بَهِيمَةً جَمْعَاءَ هَلْ تُحِسُّونَ فِيهَا مِنْ جَدْعَاءَ ثُمَّ يَقُولُ وَاقْرَءُوا إِنْ شِئْتُمْ
{ فِطْرَةَ اللَّهِ الَّتِي فَطَرَ النَّاسَ عَلَيْهَا لَا تَبْدِيلَ لِخَلْقِ اللَّهِ }

Ebû Hureyre ji Pêxemberê Xwedê hedîsek wiha radigihîne. Pêxemberê Xwedê (s.) wiha dibêje: " Her **zarok , li ser fitreta pak û paqij ya Îslamiyetê ji dayîka xwe dibe. Paşê dê û bavê wî/wê, eger Yehûdî bin wî dikin Yehûdî, eger File bin wî dikin File, eger Mecûsî bin wî dikin Mecûsî. Her wekî ku heywan bi şiklekî kamil tê xuliqandin; ma gelo tu noqsanî û kêmasiyekê di xulqiyeta wî de dibînî?** *Paşê Ebû Hureyre digot, eger hûn bixwazin vê ayetê bixwînin: Ew dînê ku Xwedê hemû mirov li ser wî bingehî afirnadiye, di afirandina Xwedê de jî tu guherandinek tüneye, ha ev e dînê rast û durust, lê pirê kesan vê rastiyê nizanin .*[1]

Şîroveyek li ser naveroka vê hedîsê:

Di vê hedîsê de bêhna cemal û spehîtiya nubûwetê tê. Ev hedîs bi ronahiya wehya îlahî bûye bersiva pirsên ku bûne mijarên sereke ji bo fîlozof û bîreweran. Ew pirsên ku ji mêj ve mêjiyê fîlozof û civaknasan meşqûl kiriye, wek mînak : Gelo dîn, di însan de fitrî ye an na? Ma gelo di însan de qencî û xêr bingeh in an ne? Dema zarok ji dayîka xwe dibe fitrata wî qabile ji bo îlhama rastî û qenciyê?

Pêxemberê me di vê hedîsê de xaleke esasî ji bo xuyê zarokên zikmakî destnîşan dike.

Ew xala esasî ev e: Belê di însan de qencî û xuyê baş bingehe. Şer û neqencî jî aridiye (paşê peyda dibe). Însan li ser sirûşteke pak tê afirandin. Ew ji bo qencî û xêrê xwediyê qabiliyetek kamil e, bes xirabkirina wî bi destê civaka ku di nav de dijî de çêdibe. Guherînerê wî dê û bav, civak û derdora wî ne. Yê ku dîn û exlaqê zarok xirav dikin fesadiya dê û bav in. Yê ku fiterata zarok bi kufrê dilewitîne dê û bav in. Her wiha yê ku dibin wesîleya qencî û îstîqameta zarok dîsa dê û bav û derdor û civaka wî ne. Zarok di dema welidandinê de wek endamê qencî û aşîtiya civakê tê afirandin . Ger bihêlin ku li ser fitreta xwe jiyan bike wê li ser îmanê bijî.

De ka werin em binihêrin ku Pêxemberê me çi temsîleke xweş çêkiriye. Xulqîyeta zarok şibandiye berxika ku bi şiklek bedew û xwediyê xulqîyetek kamil hatiye afirandin.

Yanê dema Xwedê pez, ango berxikê diafirîne bi şekl û sûretek kamil diafirîne.

Paşê mirov şikl û sûretê wî li gor pîvanên xwe diguherînin.

Herwiha însan jî di xulqiyeta xwe de xwediyê siruşteke kamil e.

Di vê hedîsê de Pêxemberê me heqîqeta însan teswîr dike, qedr û rûmetê dide însan. Însan ji qada ne qenciyê bilind dike qada ronahiya me'rîfetê. Ev nasname qedirbilindiya însan tu carî naguherîne, her dem li ser vê fitreta pak û paqij tê afirandin.

Di heman demê de ev hedîs bi rengekî zelal redkirina wan kesên ku fitretê (xulqiyetê) înkar dikin dike. Lewra ew teoriya ewrîmê diparêzin. Li gor teoriya ewrîmê tu cîh ji Xwedê re nîn e. Xwedê, parêzvanên vê teoriyê bi vê ayetê wiha şermezar dike: ***Bi rastî ew mîna heywanan in; belkî ji heywanan jî şaştirin. Lewra heywan ji xwediyê xwe re berdest dibe, lê ew kafir ji bo Xwedayê ku qencî û nî'met li wan kirî hîç berdest nabin.*** [2]

Bes li gor dînê Îslamê, Xwedê her tişt afirandiye, Xwedê xaliq e. Tiştên din jî mexlûq in. Her wekî ku ji hedîsê jî tê fêmkirin, Xwedê însan afirandiye û qabiliyet û aqil daye însan. Mirov ger aqil û qabiliyeta xwe bişxulîne wê bikaribe rêya rast bibîne. Lê dîsa jî Xwedayê dilovan însan tenê nehîştiye. Bi şandina wehyê û tayînkirina pêxemberan xwestiye ku her dem rêya rast nîşanê însanan bide.

www.arsivakurd.org

BEŞA DUDOYÊ KU RÎSALEYA DUDOYAN E

Der Heqê Remezanê de ye

Bedîuzzeman Seîdê Kurdî

Werger: Abdulkadir Bingöl



www.arsivakurdi.org

Di dawiya beşa ewil de ji ber ku hinkê qala şeaîrê Îslamê hatibû kirin, di vê beşa dudoyê ya der heqê Remezana Pîroz ku di nav şeaîran de ya herî geş û ya herî muhteşem e de dê hin hikmetên wê werin bibîr anîn.

Ev Beşa Dudoyê "Neh Nukte"yên ku di nav gelek û gelek hikmetên Remezana Pîroz de neh hikmetan beyan dike ye.)

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِيمِ

شَهْرُ رَمَضَانَ الَّذِى اُنْزِلَ فِيهِ الْقُرْآنُ هُدًى لِلنَّاسِ وَ بَيِّنَاتٍ مِنَ الْهُدَى وَ الْفُرْقَانِ

Nûkteya Ewil:

Rojiya Remezanê riknekî pêşî yê ji wan her pênc riknên Îslamê ye. Hem ji wan şeaîrên herî mezin yên Îslamê ye.

Vaye di rojiya Remezana Pîroz de gelek hikmet hene ku hem li Rubûbiyeta Xwedê dinêrin hem li jiyana komelî ya mirovan dinêrin hem li jiyana şexsî dinêrin hem li terbiyeya nefsê hem jî li şukra ne'metên Xwedê dinêrin.

Hikmetek ji wan gelek hikmetên rojiyê yên ji aliyê Rubûbiyeta Cenabê Heq ve eve ye ku:

Cenabê Heq rûyê erdê di sûretê sifreyeke ne'metê de afirandiye û her cûr ne'met di wê sifreyê de di awayê "مِنْ حَيْثُ لَا يَحْتَسِبُ" rêz kirine û Rubûbiyet û Rehmaniyet û Rehîmiyeta xwe ya tam bi vî awayî îfade dike. Mirov di bin perdeya xefletê de û di daîreya sebeban de nikarin wê heqîqeta ku ew îfade dike tam bibînin, car caran ji bîr dikin. Lêbelê di Remezana Pîroz de ehlê îmanê dikevin şûna artêşeke birêkûpêk. Nêzî êvarê herwekî ji bo mêhvaniya Sultanê Ezelî hatibin vexwendin, nêzî êvarê, bi awayekî ubûdiyetkarî nîşan didin ku li benda fermanê rawestiyayî ne ku bibêje "kerem kin!" li ber wê rehmaniyeta şefqetawer, heşmetawer û kuliyetawer bi bendetiyeke berfireh, mezin û birêkûpêk mukabele dikin. Gelo mirovên ku tevlî vê şerefa kerametê nebin layiqî navê mirovî ne?

Nukteya Dudoyê:

Hikmeteke ji wan gelek hikmetên rojiya Remezana Pîroz ya ku li aliyê şukra ne'metên Cenabê Heq dinêre eve ye ku: Wek çawa di Peyva Ewil de hatiye gotin ku ew xwarinên ku teblevanekî ji pêşgeha padîşehekî anî bihayekê dixwaze. Digel ku bexşîş ji tablevanî re tê dayîn, eger ew ne'metên gelek qedirbilnd bêqîmet bêne zenkirin û yê ew ne'metana în'am kirî nas neke çi debengiyeyek e, mîna wê jî, Cenabê Heq ne'metên xwe yên cur be cur yên bêhed û hesap li ser rûyê erdê reşandine. Di bergîdana wan da, weke buhayê wan ne'metan şukrê dixwaze. Sebeb û xwediyên wan ne'metan di şûna teblevanî de ne. Em buhayekê didin wan teblevanan, em ji wan re minêdar dibin; heta em rêz û spasiyeke zêde ya ku ew heq nekirine ji wan re nîşan didin. Hal bi hal Mûn'îmê Heqîqî ji wan sebeban bêhed û hesap zêdetir bi wesiteya wê ne'metê layiqê şukrê ye. Vaye spaskirina wî (ewe ku) bête zanîn ku ew ne'metana rasterast ji wî ne, wan ne'metana teqdîr bike û hewceyiya xwe ya ji wan ne'metan re hîs bike.

Vaye rojiya Remezana Pîroz mifteya şukreke rastî, xalis, mezin û gişkî ye. Lewre, di demên din de gelek mirovên mecbûr nemayîn hene ku dema bi bîrçîbûneke rastî re rû bi rû nemînin qîmeta gelek ne'metan nizanin. Mirovekî têr xasma dewlemend be dereceya ne'meta ku di pariyek nanê hişk de ye fêm nake. Hal bi hal di dema fitarê de ew nanê hişk, li ber çavê bawermendekî sehkera çêjkirinê şehdebûnê dike ku ne'meteke Îlahî ya gelek qîymetdar e. Ji padîşehekî bigre heta bête yê herî xizan her kes, di Remezana Pîroz de, bi fêmkirina qîmeta wan ne'metan digihije şukreke manewî. Hem ji aliyê ku di rojê de xwarin qedexe ye, holê

www.arsivakurd.org



dibêje: "Ew ne'metana ne milkê min in. Ez di xwarin û vexwarina wê de ne azadi im; nexwe malê hinekî din in û în'ama wan e. Ez li benda fermana wî me." û bi awayî ne'metê ne'met dizane; şukreke manewî dike. Eve bi vî awayî rojî dikeve şûna mifteya şukra ku ji gelek aliyan ve erka mirovî ya heqîqî ye.

Nukteya Sisêyê:

Rojî ji aliyê ku li jiyana civakî ya mirovî dinêre ji gelek hikmetên wê hikmetek jî eve ye ku: Mirov ji aliyê debarê ve di avayekî têvel de hatine afirandin. Cenabê Heq ji ber wê cihêtiyê dewlemendan vedixwîne bo alîkariya xizanan. Hal bi hal, dewlemend ancax bi birçîtiya rojiyê dibe ku rewşa dilsoj ya xizanan û bi birçîtiya wan bihesin. Eger rojî nebe, dibe ku gelek dewlemendê nefîsperest hebin ku nezanibin ka birçîtî û xizanî çi qeder nexweş e û ewana çi qeder hewceyî piyarîyê ne. Ji vî aliyî be piyariya hemcincs ya di mirovayiyê de esasa şukreke heqîqî ye. Kîjan ferd be bila bibe dibe ku yek ji wî xizantir hebe. Ew binbarê wî çendê ye ku piyariyê jê re nîşan bide. Eger ne ji ber mecbûriyeta birçîhiştina nefsê be, nikare wê qencî û alîkariya ku bi wesiteya piyariyê binbarê muawenetê ye, bike; bike jî tam nake. Lewre wê rewşê bi awayekî rastî di nefsa xwe de hîs nake.

Nukteya Çarê:

Hikmetek ji gelek hikmetên rojiya Remezana Pîroz ya li terbiyeya nefsê dinêre eve ye ku: Nefs dixwaze ew azad û serbest be û xwe welê qebûl dike. Heta, bi awayekî fitrî Rrubûbiyeteke mewhûm û hereketek wek dilê xwe (keyfe ma yeşa') dixwaze. Naxwaze bihizrîne ku ew bi ne'metên bêhed û hesap hatiye xwedîkirin. Xasma, di dinyayê de xwediyê serwet û îqtîdara wî jî hebe û xefletê jî alîkarî kiribe, bi carekê ne'metên Îlahî bi awayekî xespî û mîna dizan û mîna heywanan dixwe.

Vaye di Remezana Pîroz de ji yê herî dewlemend bigre

www.arsivakurd.org

hetanî yê herî xizan nefsa wî fêm dike ku ew ne xwediyê (xwe ye), kole ye, ne azad e, evd e. Ferman jê re neyêt dayîn nikare tiştek herî ji rêzê û herî rehet jî bike, nikare destê xwe biavêje avê; bi vî awayî Rubûbiyeta wî ya mewhûm dişikê, xwe li evdîtiye datîne, dikeve şukrê ku erka wî ya rastî ye.

Nukteya Pêncê:

Hikmetek ji gelek hikmetên ku rojiya Remezana Pîroz li aliyê xweşkirina sincê û li destjêberdana muameleyê serkêşane dinêre eve ye ku: Nefsa mirov bi xefletê xwe jibîr dike. Nikare ecza bêhed û hesap, xizaniya xwe yê bênîhayet û kêmasiya xwe ya zêde bibîne û naxwaze bibîne. Hem nahizrîne ka ew çi qas zeîf e û bi zewalê re rûbirû ye û hedefa karesatan e û ji goşt û hestiyê ku zû xira dibe û belav dibe pêk tê. Welê xeyal dike û welê xwe bi dinyayê ve digre ku herwekî ew xwediyê laşekî ku ji polayê çêbûye ye û ew ebedî ye. Bi azwerî û temaheke pir û bi eleqe û hezkirineke zêde xwe diavêje dinyayê. Xwe bi her tişta ku lezeta wê û menfeeta wê heye ve girê dide. Hem Afirînerê xwe yê ku wî bi piyariyeke tam xwedî dike ji bîr dike. Hem encama jiyana xwe û jiyana axreta xwe nahizrîne; di nav sinca xirab de digewile.



Vaye rojiya Remezana Pîroz ji yên herî xafil û herî serhişk re qelsiya wan û ecza wan û xizaniya wan bi wan dide hîs kirin. Bi wesiteya birçîtîyê hizra mîdeya xwe dike. Hewceyiya ku di mîdeya wî de ye fêm dike. Laşê wî yê zeîf çi derece petot e. Fêm dike ku hewceyiya wî çiqas bi dilovanî û piyariyê heye. Daxwazeke holê hîs dike ku dest ji fir'ewniya nefsê berde û bi ecz û xizaniyeke tam penahê dergehê Îlahî bibe û xwe amade dike ku bi destê şukreke manewî li deriyê rehmetê bixe. Eger xefletê dilê wî xirab nekiribe...

Nukteya Şeşê:

Yek ji wan hikmetên gelek ya rojiya Remezana Şerîf ya ji aliyê ku li nuzûla Qur'ana Hekîm dinêre û ya dema nuzûla herî girîng ya Qur'ana Hekîm e eve ye ku: Qur'ana Hekîm hemin di meha Remezanê de nazil bûye, ji bo ku xwe ji dema nazilbûna wê re û amade bike û bi pêşniyazeke baş wê xîtaba semawî pêşniyaz bike, di Remezana Pîroz de xwe ji hewceyiyên suflî yên nefsê û ji rewşên malaye'nî bide alî û xwarin û vexwarinê biterikîne û xwe bişibîne weziyeta ferîşteyiyê û di wî sûretî de Qur'anê herwekî nû nazil bûyî bixwîne û guhdarî bike û xîtabên Îlahî yên tê de herwekî di wê dema nizûlê de ye guhdarî bike û wê xîtabê herwekî ji Resûlê Ekrem (e.s.w.) seh dike guhdarî bike, belkê herwekî ji Cenabê Cebraîl, belkê ji Mûtekelimê

www.arsivakurd.org

Ezelî guhdarî dike xwe mezherî wê rewşa pîroz bike. Û ew bixwe wergeriya wê bike û bi hinekên din bide guhdarîkirin û dereceyekê hikmeta nuzûla Qur'anê nîşan bide.

Belê di Remezana Pîroz de alema Îslamê herwekî têkeve şûna mizgeftekê; mizgefteke welê ku bi milyonan hafiz di quncikên wê mizgefta mezin de wê Qur'anê, wê xîtaba semawî li xelkên dinyayê didin sehkirin. Her Remezan ayeta "شَهْرُ رَمَضَانَ الَّذِى أُنزِلَ فِيهِ الْقُرْآنُ " di awayekî nûranî û geş de nîşan dide. Remezan dipeyitîne ku meha Qur'anê ye. Ferdên din yên wê cemaeta mezin, hinek bixuşû' li wan hafizan guhdarî dikin. Yên din jî ew bixwe ji xwe re dixwînin. Di mizgefteke pîroz ya di rewşeke holê de yek li pey daxwazên (hewes) sûflî yên nefsa xwe here û bi xwarin û vexwarinê ji wê rewşa nûranî derbikeve çiqas sik be, çiqas dibe hedefa nefreta manewî ya cemaeta di wê mizgeftê de; eynen welê jî di Remezana Pîroz de yên dijayetiya rojîgiran dikin jî wê dereceyê hedefa nefret û tehqîra manewî ya hemû wê alema Îslamê ye.

Nukteya Heftê:

Hikmetek ji gelek hikmetên rojiya Remezanê ya li qezenca mirovê ku ji bo çandinî û bazirganiyê hatiye dinyayê dinêre eve ye ku: Di Remezana Pîroz de xêra emelan yek bi hezaran e. Bi nessa hedîsê her tîpeka Qur'ana Hekîm deh xêrên wê hene; deh hesene tên hesabê, deh fêkiyên Biheştê tînin. Di Remezana Pîroz de her tîpek (herf) ne deh in, hezar in û her tîpeka ayetên mîna Ayet-ûl Kursî hezaran û di înyên Remezana Pîroz de hîn pitir in. Û di Leylet-ûl Qedrê de sih hezar xêr tên hesabê. Belê Qurâna Hekîm ya ku her tîpeka wê sih hezar fêkiyên mayînde dide dikeve şûna dareke tûbayê ya welê nûranî ku di Remezana Pîroz de milyonan fêkiyên mayînde ji bawermenadn re dide qezenckirin. De ka were li vê bazirganiya pîroz û ebedî û bifeyde binihêre, seyra wê bike û mitale bike ku yên qîmeta van tîpana teqdîr nakin di xusareteke çi derece bêhed û hesap de ne, fêm ke!

Vaye Remezena Pîroz herwekî pêşangeh û pazareke gelek bikar ya ji bo bazirganiya axretê ye. Û ji bo ber û dahata axretê zemîneke gelek berdar (mûnbît) e. Û ji bo gihîştina (neşwûnema) e'malî meha Nîsan a biharê ye. Di hember Selteneta Rubûbiyeta Îlahî de şûna cejneka herî geş û pîroz ya kirina rê û resma ubûdiyeta beşerî ye. Û ji ber ku welê ye, bi rojiyê binbar (mukelef) bûye daku nekeve nav hewceyiyên bixeflet û heywanî yên nefsê yên mîna xwarin-vexwarinê û daxwazên nelazim û hewaperestane. Herwekî bi awayekî demdemî ji heywantiyê derbikeve yan jî ji ber ku ketiye nav bazirganiya axretê, hewceyiyên xwe yên bi dinayayê re eleqedar bi awayekî demdemî bihêle û têkeve rewşa merivekî axretê û giyaneke ku bûyî cesed û xuya bûyî; bi rojiya xwe biawayekê ji Semediyetê re neynikdariyê bike. Belê remezana Pîroz di vê dinyaya fanî de, di nava vî temenê fanî de û di vê jiyana kurt de temeneke mayînde û jiyaneke baqî ya dirêj dihundirîne û dide qezenckirin.

Belê Remezaneke tenê dikare semereyên (berên) temeneke heştê sal (ji mirovan re) bide qezenckirin. Lêbelê Leylet-ûl Qedr bi nesa Qur'anê ji hezar şevî xêrtir e, eva hanê delîleke qet'î ya vê razê ye. Belê wek çawa padîşahek di maweya selteneta xwe de, hema bêje her sal, yan bi navê cilûsa hûmayûn yan jî ji bo gihiştina cîlweyeke şe'şe'eya selteneta xwe hin rojan dike cejn. Hemwelatiyên xwe di wê rojê de neku di daîreya zagonên giştî de, belkê digihijîne qenciyên xwe yên

www.arsivakurd.org

taybet, hizûra xwe ya bê perde û îltîfata xwe ya xas, îcraeta xwe ya fewqelade; û wî gelê xwe yê layiq û sadiq rasterast digihîjîne tewecûha xwe ya xas. Eynen welê jî: Padîşehê Zûlcelalê hijdehezar aleman ku Sultanê Ezel û Ebed e; Qur'ana Hekîm ku fermana alîşan e û li wan hijdehezar aleman dinêre û tewecûhê wan dike, di Remezana Pîroz de nazil kiriye. Helbet pêwistiya hikmeta wî ye ku ew Remezan bibe cejneke Îlahî ya taybet û bibe pêşangeheke Rebbanî û mecliseke rûhanî. Hemin ew Remezan cejn e; helbet ji bo ku mirovan ji meşxeleyên suflî û heywanî bikêşe dê emrê rojiyê bêt kirin. Û ekmela wê rojiyê jî: Mîna mîdeyê bi hemû hestan, bi hemû cîhazên însanî yên mîna çavî, guhî, dilî, xeyalê û fikrê jî bi awayekî rojiyê bide girtin. Ango, ji heramî û ji tiştên nelazim bikêşe û her yekî ber bi ubûdiyeteke mexsûs ve bajo. Wek mînak: Zimanê xwe ji derewan, ji nekamiyê û ji gotinên xirab bide alî û bi vî awayî rojiyê pê bide girtin. Û wî zimanî bi tiştên mîna xwendina Qur'anê, zikr û tesbîh û selewat û îstîxfarê mijûl bike... Wek mînak: Çavê xwe ji nezera heram û guhê xwe ji sehkirina tiştên xirab bide alî û çavê xwe di îbretê de û guhê xwe di guhdarîkirina gotinên heq û Qur'anê de serf bike, texlîteke



rojiyê bi cîhazên (orxan) din jî bide girtin. Jixwe ji ber ku mîde karxaneya herî mezin e eger bi rojiyê navberê bide kar (tatîlê eşxal) dezgehên din yên biçûk bi hêsanî dikare bide tebaiyetkirin.

Nukteya Heştê:

Hikmetek ji gelek hikmetên ku Remezana Pîroz li aliyê jiyana şexsî yê mirovî dinêre eve ye ku:

Ji mirovî re, parêzeke madî û manewî ya ji cûreya dermaneke herî girîng e û ji aliyê tibê ve jî hîmye ye ku: Ku nefsa mirovî der barê xwarin û vexwarinê de awayê wek dilê xwe (keyfemayeşa') tevbigere, hem ji aliyê tibê ve zerarê dide jiyana madî ya şexsî, hem ku nebêje 'helal e-heram e' êrîşî her tiştî bike herwekî jiyana manewî jehredar bike. Êdî îtaeta qelbî û rûhî li wê nefsê nexweş tê. Bi serkêşî dezgîna xwe dixwe destê xwe. Êdî mirov nikare lê siwar bibe, ew li mirov siwar dibe. Di Remezana Pîroz de, bi wesiteya rojiyê bi awayekî dielime parêzê; hewl dide riyazetê bike û hîn dibe ku li fermanan guhdarî bike. Li mîdeya reben jî bi wê xwarina berî hezim û gibirînê xwarin li ser xwarinê danagre, nexweşînan nakişîne serê. Û ji aliyê ku bi wesiteya fermanê helal terikandiye, qabîliyet pê re çêdibe ku li fermana ku ji aqil û şerîetê tên yên xwejêdûrkirina heraman guhdarî ke. Hewl dide ku jiyana manewiya xwe xirab neke.

Hem pirtirînên mirovan gelek caran bi birçîtîê re rûbirû dimînin. Birçîtiya ku ji boyî sebr û semaxê bedenparêziyekê dide, hewceyiya wê bi riyazetê heye. Rojiya Remezana Pîroz maweya birçîtiya ku panzdeh demjimêran, eger bê paşîv be bîst û çar demjimêran dewam dike sebr û semaxek e

www.arsivakurd.org

> *Nefs naxwaze Rebê xwe nas bike, mîna fîr'ewn Rubûbiyeta xwe dixwaze. Çiqas were ezabdan ew demar di wê de dimîne. Bes bi birçîtiyê ew demara wê dişikê.*

û riyazet û bedenparêziyek e. Nexwe dermaneke bêsebrî û bêsemaxiya ku karesata mirovan dike du qat, rojî ye.

Hem gelek xizmetkarên wê karxaneya mîdeyê hene. Hem gelek cîhazên mirov yên bi wê ve pêwendidar in hene. Nefs eger di wextê rojê yê mehekê demdemî de nekeve betlaneya şuxulan, îbadetên xusûsî yên wan xizmetkarên wê karxaneyê û wan cîhazan bi wan dide ji bîr kirin, bixwe re dide mijûlkirin û wan di bin zordestî û fermanên xwe de dihêle. Wan cîhazên din ên mirovî jî bi qerebalix û dûxana wan çerxên karxaneya manewî tevlîhev bike. Her tim bala wan dide ser xwe. Erka wan ya ulwî bi awayekî demdemî dide ji bîr kirin. Ji ber wê çendê ye ku; berê û pêş de ehlê welayetê ji boyî tekemûlê, xwe hînî riyazetê, kêmxwarin û kêmvexwarinê kirine. Bes, ew xizmetkarên wê karxaneyê bi rojiya Remezana Pîroz fêm dikin ku sirf ji boyî wê karxaneyê nehatine afirandin. Û cîhazên din ji dêl kêf û zewqa sûflî ya wê karxaneyê, di Remezana Pîroz de di kêf û zewqa ferîşteyî û giyanî de lezetê distînin, berê wan dide wan. Ji ber wê çendê ye ku di Remezana Pîroz de bawermend li gorî dereceyên xwe digihijin nûr û feyz û surûrên cihê cihê yên manewî. Di wê meha bimbarik de, bi wesiteya rojiyê gelek bipêşdeçûn û jêfeyîzgirtinên wan hestên mîna dil, giyan, aqil û sirê hene. Tevî ku mîde digrî jî ew (hestana) bi awayekî mesûmî dikenin.

Nukteya Nehê:

Hikmetek ji gelek hikmetên rojiya Remezana Pîroz ya ji aliyê rasterast şikandina Rubûbiyeta mewhûm ya nefsê û ya nîşandayîna ecza wê ya danzanîna ubûdiyeta wê eve ye ku:

Nefs naxwaze Rebê xwe nas bike, mîna fîr'ewn Rubûbiyeta xwe dixwaze. Çiqas were ezabdan ew demar di wê de dimîne. Bes bi birçîtiyê ew demara wê dişikê. Vaye, rojiya Remezana Pîroz rasterast derbeyekê li eniya fîr'ewniya nefsê dide, dişikêne. Ecza wê, qelsiya wê û xizaniya wê nîşan dide. Dide zanîn ku ew bende ye.

Di rîwayetên hedîsê de heye ku: Cenabê Heq ji nefsê re gotiye ku: "Ez çi/kî me, tu çi/kî yî?" Nefsê gotiye: "Ez ez im, tu tu yî!" Ezab dayiyê, avêtiye Dozexê, dîsa pirsiyar kiriye. Dîsa gotiye: "Ene ene, ente ente." Çi cure ezab dayiyê dev ji xweperestiyê bernedaye. Piştre bi birçîtiyê ezab dayiyê, ango birçî hiştiye. Dîsa pirsiyar kiriye. "Men ene vema ente?" Nefsê gotiye: "اَنْتَ رَبِّی الرَّحِیمُ وَاَنَا عَبْدُكَ الْعَاجِزُ" Ango "Tu Rebê min ê Rehîm î, ez bendeyekî te yê aciz im.

اَللّٰهُمَّ صَلِّ وَسَلِّمْ عَلَى سَيِّدِنَا مُحَمَّد صَلَاةً تَكُونُ لَكَ رِضَاءً وَ لِحَقِّهِ اَدَاءً بِعَدَدِ ثَوَابِ قِرَائَةِ حُرُوفِ الْقُرْآنِ فِي شَهْرِ رَمَضَانَ وَ عَلَى آلِهِ وَ صَحْبِهِ وَ سَلِّمْ

سُبْحَانَ رَبِّكَ رَبِّ الْعِزَّةِ عَمَّا يَصِفُونَ *وَسَلَامٌ عَلَى الْمُرْسَلِينَ *وَ الْحَمْدُ لِلّٰهِ رَبِّ الْعَالَمِينَ آمِينَ

Lêborînxwestin:

Ev beşa dudoyê ji ber ku bilez, di çi xulekan de hatiye nivîsandin û ez û katibê ku reşbelek nivîsandîye em herdu nexweş bûn, helbet dê tê de hin tevlîhevî û kêmasî hebin. Em ji birayên xwe daxwaz dikin ku bi çavekî musameheker lê binêrin. Wê dera ku munasib bibînin destûr heye ku sererast bikin.

www.arsivakurdi.org

Alim û Şairekî Wenda: Siyahpoş

MEHABAD HÊLÎN



Li Kurdistanê gelek alimên mezin gihane. Ji wan hinekan bi sedan telebe perwerde kirine. Gelekan ji wan pir eser li pey xwe hiştine û navê xwe di tarîxê de bi herfên zêrîn dane nivîsandin. Mecduddîn îbnul-Esîr, Izzeddîn îbnül-Esîr, Ziyaeddîn îbnul-Esîr, Îbnî Teymiye, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî çendek ji wan in. Ji dervayê van jî gelem alimên mezin hene ku bê nav û nîşan in. Tu eser li pey xwe nehiştine û navê wan di nav rûpelên tarîxê de naxuyê.

Siyahpoş di edebiyata klasîk a Kurdî de xwedî cihekî xisûsî ye. Wekî piraniya edîbên wê serdemê, helbestên xwe li ser wezna erûzê honandine û daye pey şopa şairên Kurd yên wekî Herîrî, Feqî, Cizîrî û Xanî. Herwiha alimekî mezin jî bûye ku li medreseyan ders daye û feqî gihandine. Lê heta niha baş nehatiye zanîn û naskirin. Di gel ku ew jî şairekî mezin û di edebiyatê de kûr çûye jî, wekî şairên me yên din nehatiye zanîn. Hem berhemên wî nehatine zanîn û hem jî agahiyên der barê wî de pir kêm û tevlihev in.

Li gor hin rîwayetan, Siyahpoş bi eslê xwe ji rojhilatê Kurdistanê ye. Lêbelê tam ne diyar e bê ji kîjan bajar û herêma rojhilat e. Di hin çavkaniyan de navê Hekarî û Urmiye derbas. Li gor

www.arsivakurd.org



bergê dîwaneke Siyahpoş ku ji nava Weşanên Nûbiharê de hatiye weşandin

hin agahiyan ew ji Diyarbekirê ye, li gor Celîlê Celîl û Feqî Huseyn jî ew ji devera Urmiyê ye. Li gor hin rîwayetan navê wî yê rast Mûhemmed Cewad e û ew xelkê derdora Urmiye, Têrgever, Mêrgever û Salmasê ye.1

Heyama jiyana wî jî sedsalên 18-19an in, lê der barê vê yekê de jî çu çavkaniyên ewledar nînin di dest de. Tenê ev heye ku di helbesteke xwe de bi hesabê ebcedê tarîxek daye. Ew tarîx jî 1820-30 ye. Li gorî vê di sedsala 19an de jiyaye.

Tiştên ku ji wî wekî eser gihîştine ber destê me, tenê kitêba wî ya bi navê "Seyful Milûk û Melke Xatûn"2 heye. Ew jî wekî mesnewiyên din ên şerqê yên wekî Leyla û Mecnûn, Ûsiv û Zuleyxa çîrokek Erebî ye. Lê wî ev çîrok bi awayekî menzûm bi Kurdî nivîsandiye. Lê di nava mesnewiyê de xezelên wî jî hene.

Siyehpoş bi Tirkî, Erebî û Farisî zanibûye û ew di helbestên xwe de bi kar anîne. Cumleyên Erebî û Farisî ji serî heta dawiya mesnewiya wî ji Kurdî ne kêmtir in. Bi qasî Kurdî, Farisî û Erebî jî bi kar aniye. Hem cumle, hem tabîr û hem jî kelîme. Ji xeynî wan çend beytên bi Tirkî jî hene, wekî vê beytê:

Zilf û xalên maherûyan çok Siyahpoş ettiler
Korkarim ben kara ola çadir û seywanê ma

Rojen Barnas der barê wî de wiha dibêje: "Siyehpûş an Siyahpoş helbestvanê Kurmancînivîs ê herî pêşî yê li navçeya Silîvan Siyehpûş e. Li gora agahdariyên ku muderis Mele Hadî efendî dide me, "Siyehpûş berî ku were Silîvan li gelek cîhan geriyaye; li ba aliman, li ba mîrekan û hwd. Pêşi tê Hekkariya, dû re dibihîze ku alim û mîrekên mezin li Farqînê hene, ew jî tê Farqînê. Li gor texmînan 20-25 saliya xwe da hatiye Silîvan. Demek dirêj li Kurbeytê dimîne û li wê derê meletiya gund dike. Di helbestên wî de, di wêjeyawî de, mirov dizane ku Siyehpûş alimekî mezin e." Li gora ramana wî Siyehpûş 137 sal berê di 1868 de hatiye Silîvan. Di pey de Siyehpûş diçe Bexdayê."[3]

Dema ku meriv helbestên Siyahpoş bi hûrbînî dixwîne û li serê vedibe, bandora Melayê Cizîrî ya li ser wî pir zêde dixuyê. Ger bê gotin: "Di edebiyata klasîk a Kurdî de, şairê ku bi terz, uslûb, teswîr û hunera xwe ya helbestê herî zêde dişibe Melayê Cizîrî kîjan e?" Bawer im ku meriv bêje: Siyahpoş e, dê ne cewabeke şaş û çewt be. Lewra di teşbîh û alegoriyên xwe de remz û nîşanên Mela gelekî bi kar anîne. Meriv dikare vê helbesta wî wekî mînaka vê nêzîkbûn û wekheviyê bide:

Siyahpoş
Min qebûl e xemr û saqî dêr û zennar û senem
Min nebit seccade û ewrad û seddaneyê
Ey hebîba, ger cehennem dave bit û tu dane bî
Sed qesem bê biçme navê ez bi qesda daneyê

Melayê Cizîrî
Wê kagulê çînên dilê qelbê Melê dav dane lê
Dava dilan nêv sunbulan ser sorgulan menqûri bû
Canê xwe me kir daneê dava ku vedayî
Ahûsifet ew pê hissiya rahê Xeta girt

Wekî ku tê zanîn edebiyata klasîk li ser îrfan û hezkirina Xwedê ava bûye. Piraniya şairên Kurdan

www.arsivakurd.org

jî arif bûne û ketine pey marîfetullahê. Yanî xwestine Xwedê nas bikin û bi layiqî îbadeta wî bikin. Wekî ku Bedîuzzeman di Gotinan de dibêje: "Bingeh, rûh û nûra hemî ilmên heqqaniyetê marîfetullah e." Ev gotin jî xwe dispêre hedîsekê ku dibêje: "Me bi layiqî tu nas nekir." Herwiha ev jî telmîh e bi bal ayeta Quranê. Ew ayeta ku melaîket li nezanîna xwe mikur tên û bi ilmê Xwedê yê kullî û ezelî îqrar dikin: "Tu ji her kêmasiyan bêrî yî. Ji xeynî ilmê ku te bi me daye zanîn, tu zanîna me tune. Yê ku bi her tiştî dizane tu yî."[4]

Arifên Kurdan jî wekî arifên Ereban û Farisan sembol û teswîrên îrfanî bi kar anîne. Peyvên wekî, cehennem, pût, senem, pûtxane hemî remz û sembol in. Yan na di rastiya xwe de ew ehlê Xwedê bûn û bêemriya Xwedê nedikirin.

Wekî ku Ehmedê Xanî di Memûzînê de dibêje:

Bes qenc e ji bo me 'amîyan ra
Her ev bes e bo me 'asîyan ra

J'ewel ve Xudê bi 'heq binasîn
Herçende qusûr û 'kêm û 'kas în

Paşê bi dilê xwe jê bitrsîn
Dînê xwe ji 'aliman bipirsîn

Çawa ku bibêjin em wesa bîn
Hetta ku ji rû dinê wefa bîn

Pala xwe bideyne lutfê Barî
Belkî me bibexşitin ji narî

Yanî kesên wekî me ewam û asî, beriya her tiştî divê Xwedê nas bikin. Herçiqasî kêmasiyên wan û gunehên wan zêde be jî, divê xwe bispêrin Xwedê. Piştre divê em bi dilê xwe bitirsin. Herwiha lazim e em dînê xwe ji aliman bipirsin. Ew alimên me jî çawa qala dîn bikin, divê em heyata xwe li gorî wê bimeşînin. Heta ku em xatirê xwe ji dinyayê bixwazin û berê xwe bidin rebbê xwe, divê em li ser vê rêçikê bimeşin. Dema ku em qencî û kerema Xwedê bawer bin û em berê xwe bidin wî, ew jî dê me ji agirê cehennemê xelas bike. Xwedê me ji rêya alimên mutteqî û salih dûr nehêle...

Siyahpoş

Dilberek min dî bi çavan
Sed elîf pabûsî bû
Agirek berda hinavan
Şemh û der fanûsî bû.

Şemh û rihniya zilamê
Agirek berda di amê
Zilf û xalên di temamê
Qeyd kirin mehbûs bi damê

Şerbeta şîrînkelamê
Terkî min nadit mudamê
Sed şikir îro selamê
Kir li min taze xulamê

Şerh û teqrîrê Isamê
Fikr û teswîrê kelamê
Reng û elwanê di camê
Şibhetî tawûsî bû.

Şibhetî çavê duyengê
Qews û ebrûyê du bengê
Mir-reyê tîra xedengê
Zilf û xal û xuncerengê

Kes nedî qet wî çi rengî
Neqşê Maçîn û Firengê
Qet nema qet wî çi rengê
Hikmeta Têmûr û lengê

www.arsivakurd.org

Sifdera mêrê du cengê
Şêr û mexmûr û pilingê
Sed hezaran wek bişengê
Hikmekî kawûsî bû.

Min qebûl e hikmê rindan
Serxweş û sûretlewendan
Lê çi bêjim qewl û bendan
Ketme tora le'l û xendan

Zehmetek wan pir bi min dan
Kefşe bim wek gaz û sindan
Dil hedef kir tîr li min dan
Lê ji halê mestemendan

Bê eded cewher bi min dan
Lewmenoşê can bi der dan
Xemzeyê pir mekr û fendan
Lê li min casûsî bû.

Lê li min berda girînê
Mihbeta wê nazenînê
Bê sebeb ketme nivînê
Ax û efxan û enînê

Lê ji ber hisna şêrînê
Şeq bû bedra yasemînê
Kanî hûra ser zemînê
Carekê bête girînê

Ev bi xef, hal im bibînê
Merhema bavê birînê
Zilf û xal û xemrevînê
Bo me Calînosî bû.

Zilf û xal û mest û naz e
Işweyê wan xemzebaz e
Gerdenê gerdenfiraz e
Lê ji eşqa rûyê faz e

Cerd dikin ehlê mecaze
Ta sedî yasî û qaze
Xef dibin esrar û raze[5]
.....[6]

JÊRENOT

1 Celîlê Celîl, Keşkula Kurmancî, Wîen 2004.
2 Tê gotin ku navê Seyful Milûk û Melke Xatûn şaş e, rastiya wê Seyful Milûk û Bedîulcemal e. Lewra Melke Xatûn xwişka Bedîulcemalê ye û evîndara Seyful Milûk jî Bedîulcemal e. bn. Seyful Milûk û Bedîulcemal, amd, Bedirxan Amedî, Weşanxanên Nûbihar 2012.
3 Silivan.org
4 Beqere, 32.
5 Klasîkên Me An Şair û Edîbên Me Ên Kevin, Herekol Azîzan Hawar, jimar 33.
6 Ji ber ku ev rêzik di nusxeyê de nebûye, wisa nuqte hatiye dayin. Di xebatên li ser klasîkan tevan de dema ku herfek an jî cumleyek neyê xwendin, hibr li serê hatibe rijandin an jî qetiyabe ev îşaret tê danîn (.....) (Edîtoriya kovarê)

www.arsivakurd.org

Ehemmiyeta Çûna li Pey Sunneta Pêxember (s)

M. Ebdusselamê Şad

بسم الله الرحمن الرحيم

الحمد لله رب العالمين والصلاة والسلام على سيدنا محمد وآله أجمعين.

Di heyata dinyayê da xaye û armanca hebûna însan îbadet e. Ew e sedemê şandina pêxemberan û dagerandina kitêbên îlahî: "{وما خلقت الجن والإنس إلا ليعبدون} Min cinn û însan afirandin da ku tenê ji min re îbadetê bikin."

Xwedayê mezin însan ebes, bêfeyde û tewş ne-afirandiye. Belkî ji bo armancekê, ji bo wezîfeyeke mezin afirandiye. Herwiha ew bê ser û ber û bi awayekî ku nizanibe ka dê wezîfa di stûyê xwe de çawa pêk bîne jî nehiştiye. Belê ew afirandiye, 'ilm û zanîn dayiyê û rêka ku wî digihîne rizaya Xwedê jî nîşanê wî daye. Ew rê jî rêyeke bi tenê ye, rêberê wê kitêba pîroz e, dergehê wê jî Pêxember (s) e. Êdî kî bixwaze bê rêber bide ser wê rêyê gumreh dibe (rê wenda dike). Kesê bixwaze bikeve hundir lê bêyî ku rêya xwe bi dergehê rîsaletê bixîne û bê mifteya pêxemberiyê bimîne, ji rêya rast averê dibe. Loma Xwedayê mezin bi zimanê qasid û pêxemberên xwe îzah kiriye ka divê bendeyên wî tewhîdê çawa nas bikin, çawa wî yekta bidêrin û çawa jê re îbadetê bikin. Cihê wê îbadetê û rê û rêbaza wê ji ji wan re kifşe kiriye. Hem bi wan daye zanîn ku divê îbadet ji wî tenê re were kirin û divê ew îbadet jî tenê bi awayê ku wî di dîn de rave kiriye, were pêkanîn.

Di Quran û sunnetê de gelek ness hene ku xwegirtina bi wehyê û çûyina li pey wê teşwîq dikin û ji çûyina li pey kêf û hewesa nefsê û rêşaşiyên din didin tirsandin: "{وأن هذا صراطي مستقيما فاتبعوه ولا تتبعوا السبل فتفرق بكم عن سبيله ذلكم وصاكم به لعلكم تتقون} Rêya min a rast ev e, bidin pey wê, nedin pey rê û rêçikên mayî. Lewra dê we ji rêya wî biqetînin. Şîretê li we dike da ku hûn xwe pê bigirin û bibin xwedî teqwa û perhîzkar."

Ji dijberiya ferman û sunnetên qasidê xwe jî daye tirsandinê û wiha ferman kiriye: "{فليحذر الذين يخالفون عن أمره أن تصيبهم فتنة أو يصيبهم عذاب أليم} Ew kesên dijî fermana wî (qasidê min) diçin bila xwe biparêzin ku fitne yan jî 'ezabekî bi êş û elem bi ser wan de neyê"

Ew hedîsa ku dayika 'Aîşe ragihandiye, qanûn û qaîda vê meselê daniye û ew me'na bi îcazeke

www.arsivakurd.org

xweşik rave kiriye, dayika 'Aîşe dibêje: Resûlullah kerem kiriye: "(من أحدث في أمرنا هذا ما ليس منه فهو رد) Her kî tiştekî di vî dînê me de tunebe ji ber xwe çêke ew merdûd e, nayê qebûlkirin." Di rîwayeta Îmamê Mislim de ev hedîs wiha hatiye: "(من عمل عملا ليس عليه أمرنا فهو رد) Kesê 'emelekî ne li gorî dînê me bike ew merdûd e, nayê qebûlkirinê."

Ev hedîs esl û bingehekî mezin e ji bo dînê Îslamê. Hem jî ev ew hedîsa (إنما الأعمال بالنيات.....) "'Emel bi goranî niyet û qesdê qîmet jê re heye" tam û tekûz dike. Dîn hema ji ûsûl û fûrû'ê bigire, bi zahir û batinê xwe ve bi tevayî di hundirê van herdu hedîsan de ye; lewra hedîsa Îmamê 'Umer mîzana kar û 'emelê derûnî ye, hedîsa dayika 'Aîşe mîzana 'emelên zahir ên derveyî ye. Di wan de îxlasa ji bo Xwedê û çûyina li ser şopa pêxember heye ku ev her du şert in ji bo qebûlbûna her 'emelî, her kar û barî. Çi gotin be, çi 'emelên din bin, çi 'emelê derûnî yên hundir bin, çi yên bi 'eza û wesleyê derve bin.

Hedîsa me dide zanîn, her çi 'emelê ku ne li gorî fermana Xwedê û qasidê wî be, ew tê redkirin û nayê qebûlkirin. Di vê gotina Resûlullah de ku dibêje: (ليس عليه أمرنا) ...li gorî dînê me nîne... tê de îşaretî bal wî qasî ve heye ku hemû kar û 'emelên bendeyan divê li gorî şer'a Xwedê bin. Îcar kar û 'emelên kê munasibî şer'a Xwedê bin ew li nik Xwedê meqbûl in. Yên ku ne munasibê wê bin jî merdûd in.

Ji hedîsa me wisa diyar dibe ku ew îbadeta ku însan ji bo wê hatiye afirandin, dixwaze kesê Misilman hemû gotin û kirinên xwe, hemû rabûn û rûniştinên xwe hema hemû jiyana xwe li gorî rê û rêbaza şer'a Xwedê bi rêk û pêk bike û li gorî wê bijî. Her çi dike divê hema ji bo îta'eta Xwedayê xwe bike, ji boy radestiya xwe ya ji Xwedayê xwe re pêk bîne. Di vî qasî de jî wê gotina Xwedê te'ala ya ku tê de qala bawermandan dike, divê ji xwe re bike şî'ar; Xwedê dibêje: {إنما كان قول المؤمنين إذا دعوا إلى الله ورسوله ليحكم بينهم أن يقولوا سمعنا



وأطعنا وأولئك هم المفلحون} Dema ku kesên bawe - mend bi bal Xweda û qasidê wî tên gazîkirinê da ku di navbera wan de hukim bê dayin, hema gotina wan ew e ku dibêjin: Me seh kir û em ya wan dikin. Aha yên ku gihîştine xelasiyê, ew bi xwe ne.

* * *

Girîngiya niyet û mexseda ji kar û 'emel:

Xwedê hema li mexsed û niyetan mêze dike. Ew ji bo emel wekî ruh in ji bo cesed, de îcar rewşa cesedê bêruh çawa ye? Rewşa dareke ku ji kokê ve hatiye rakirin çawa ye hûn biramin? Herçi îbadet û perestiyên ku bi niyeteke çak û bi mexsedekî durist nehatiye kirin di mîzana Xwedê de tewş e û pûç e. Wekî leylanekê ye ku meriv guman dike av heye, dema meriv diçe cem tu tiştek nîne. Loma şer'a Xwedê girîngiyeke mezin daye

www.arsivakurdi.org



mexsed û niyetan, di vî warî de jî gelek ayet û hedîs hatine

Ew hedîsên mezin ên ku ev me'ne rîwayet kirine, yek jê ew hedîsa Sehîha Buxarî û ya Mislim a ji Îmamê 'Umer hatiye ragihandinê ew e ku dibêje: (عن عمر رضي الله عنه قال : سمعت رسول الله صلى الله عليه وسلم يقول : (إنما الأعمال بالنيات , وإنما لكل امرئ ما نوى , فمن كانت هجرته إلى الله ورسوله , فهجرته إلى الله ورسوله , ومن كانت هجرته لدنيا يصيبها أو امرأة ينكحها فهجرته إلى ما هاجر إليه) Min ji Resûlullah bihîst wiha digot: 'Emel li gorî niyet û qesdê qîmet jê re heye, ji her kesî re tişta niyet kiriye heye, êdî kesê ku koçberiya li bal Xwedê û qasidê wî ve be, koçberiya wî jixwe ber bi Xwedê û qasidê wî ve ye. Kesê ku koçberiya wî ji bo bidestveanîna malê dinê yan ji bo jineke ku hez dike be, êdî koçberiya wî ji bo çi be jixwe ji bo wê bûye..

Ev hedîs, yek ji wan hedîsan e ku bingeha dînê Îslamê ye.

Niyet, ew qesda dil e ku xwediyê xwe diajo bi bal karekî ve, mexsedên bendeyan li gorî ya di dile wan gelek diguhere.

Îcar gotina Resûlullah ku dibêje: "(إنما الأعمال بالنيات) 'Emel, li gorî niyet û qesdê qîmet jê re heye." Du tiştan dixwaze;

Yekem: ew e ku çi 'emel dibe bila bibe, bê niyet î'tibar pê nayê kirin. Loma her kar û 'emelê 'evd yê bi îradeya xwe dike, li gorî niyetekê ye ku ew niyeta wî biajo ser wî karî.

Ya duduyan jî ew e ku: duristbûn û betalbûna 'emelan, qebûlbûn û redbûna wan, xêr û sewaba wan û nebûna sewabê her bi niyetê ve ye.

'Îbadet û 'emelên salih ên qenc çi celeb dibin bila bibin, şer'en bêyî niyetê durist nabin. Yanê 'emelê ku dixwaze bike divê kifş bike, ji yê mayî veqetînwê niyeta e. Wekî niha nimêja nîvroyê ji ya 'esrê veqetîne, rojiya ferz ji ya nafîle veqetîne.

Niyet çewa ji bo veqetandina 'îbadetan ji hev lazim e, herwiha ji bo veqetandina 'îbadetê ji 'adetê jî divê hebe. Wekî niha serşûştin çawa ji bo paqijiyê û hênikayê dibe, herwiha ji bo hilanîna nepakiyê jî dibe, ji bo nimêja îniyê jî dibe, ya tişta ku van ji hev vediqetîne niyet e.

Me'na duduyan: vebijartina kesê ku bi wî 'emelê tê qesidkirinê ye. Gelo ew zatê Xwedê ye, yan kesekî din e. Aha ev hedîsa şerîf gazî 'evdê Xwedê dike, wî vedixwîne bal wî qasî ve ku her karê ku dike, her tişta ku diterikîne, hemû gotin û kirinên wî her ji bo Xwedê bin. Divê guhê wî timî li ser pêkanîn û tekûzkirina îxlasê û li ser berterefkirin û dûrxistina heçî tiştê dijî îxlasê be. Ev me'na ye ku pir caran di fermanên Resûllah û di gotinên pêşiyên ummetê de hatiye. Loma cenabê Pêxember gotiye: "(وإنما لكل امرئ ما نوى) 'Emel li gorî niyet û qesdê qîmet jê re heye." Yanî ji kar û barê însan -çi çak çi xerab- tişta ku jê re

www.arsivakurd.org

heye hema ewa ku beraberê niyetê ye. Êdî kî niyeta xwe xweş bike da ku bibe wesîleya nêzîkbûna Xwedê, bi qasî niyeta wî, li gorî niyeta wî jê re xêr û sewab heye. Kesê ku di niyeta wî de kêmasî hebe, di xêra wî de jî ew qasî kêmasî çêdibe. Kesê ku berê niyeta wî bi bal tişt û mexsedên bêkêr be, xêr û sewab jê diçin, jê mehrûm dibe, di niyeta wî de çi hebe ew bi dest dikeve.

Cenabê Pêxember ji bo wan 'emelên ku di şikl û sûretê xwe de wekî hev in, lê ji ber bêxêrbûn û bikêrbûna niyeta xwediyan duristbûn û betalbûna wan diguhere mînakek aniye; ew jî mînaka koçberbûna ji welatê kufristanê bi bal welatê Îslamê ve. Wekî koçberiya cenabê Pêxember û sehabiyên wî ji Mekkê bi bal Medînê ve ye. Cenabê Pêxember dibêje: Ev koçberî li gorî niyet û mexseda xwediyê xwe diguhere. Kesê ku sirf ji bo hezkirina Xweda û resûlê wî, ji bo fêrbûna Îslamê û ji boy jiyana li gorî şer'a Xwedê ku li Mekkê ji ber zordestiya muşrikan nikaribû wê bijî, koçber bûye ew bi rastî koçber e, mihacirê heqîqî ye. Yê ku dibe xwediyê xêra hîcreta bi bal Xwedê û resûlê wî ve ew kes e. Lê ew kesê ku ji bo tiştekî dunyewî yan ji bo jineke ku dixwaze ji xwe re bîne koçber bûye, ew ji wan kesên ku hîcreta wan bi bal Xweda û resûlê wî ve ye nîne. Ji wê koçberiya wî çi niyet kiribe, ew tenê jê re heye. Emelên salih, karên qenc ên bikêr ew jî di vî qasî de wekî hîcretê ne. Qencbûn û neqencbûna wan, duristbûn û betalbûna wan li gorî niyeta wan e. Dema ji Resûlullah hat pirsîn: merivek ji bo dilêriyê şer dike, yek ji bo eqrebatî û qewmê xwe, yan jî ji bo nav û denge xwe, ji wan kîjan di rêya Xweda de ye? Cenabê Pêxember got: Ew kesê ku ji bo hukmê Xweda bibe hakim di rêya Xweda de şer dike. 'Emel li gorî wê bawerî û îxlasa di dilê meriv de ji hev cuda dibin û xêr û sewaba wan jî li gorî wê kêm-zêde dibe. Hetta kesê ku xwediyê niyeteke baş be û qet 'emel neke jî jê re xêra kesê 'emelkirî heye. A loma wê dema ku ji sehabiyan hinek kesê xwedan me'zeret li Medînê man û nikaribûn herin cenga Tebûkê, cenabê Pêxember di heqê wan de wiha gotibû: "(إن بالمدينة أقواماً ما سِرْتُم مسيراً، ولا قطعتم وادياً إلا كانوا معكم حبسهم العذر) Li Medînê hinek kes hene ku uzrê wan nehiştibû ew digel we bihatana, hûn çi qas rê çûbin û di çend newalan re derbas bûbin ew hey bi we re bûn."



Hukmê niyetê çawa ku di 'îbadetan de heye, herwiha di tiştên mubah ên serbest de jî heye. Eger niyeta kesekî ew be ku bi ked û xebata xwe ya mubah emrên Xwedê û wezîfeyên din yên dînî pêk bîne; ev niyeta qenc beraberî xwarin, vexwarin, rabûn rûniştin û kar û barê wî be, li ser vê niyeta xwe xêrdar dibe. Kesê ku niyeteke wiha di dilê wî de tunebe, xêreke mezin ji dest çûye. Mu'azê Cebel dibêje: "(إني لأحتسب نومتي كما أحتسب قومتي) Ez çawa xêra nimêja xwe ji Xwedê hêvî dikim, herwiha xêra xewa xwe jî hêvî dikim." Di hedîsa sehîh de cenabê Pêxember dibêje: "(إنك لن تعمل عملاً تبتغي به وجه الله إلا أجرت عليه، حتى ما تجعله في فيّ امرأتك) Eger tu di 'emelê xwe de rizaya Xwedê ji xwe re bikî armanc, tu çi dikî bike dixwazî bila hit û mit be, tu yê ji wî 'emelî xwedan xêr bibî. Hetta li ser wî pariyê nan ê ku tu didî devê jina xwe jî tu yê xwedan xêr dibî."

Lê belê eger 'emel heram be, bi tu awayî nabe sedemê nêzîkbûna Xwedê. Hetta eger yekî ku 'emelekî nerewa kiribe îddi'a bike ku niyeta wî baş bûye jî, dîsan xêr jê re tuneye.

www.arsivakurd.org



Umdetul Ehkam

ÎMAMÊ MEQDISÎ
Werger û şîroveyên pêwist:
Umîd Demîrhan

www.arsivakurd.org

PÊŞGOTINA WERGÊRÎ

Di nav Kurdên bakurî de berhemên li ser hedîs û sîretê ji hemû cureyên ilman kêmtir in. Her çiqas li dewrana dîrokê di hemû ilmên hedîs û sîretê de destê zanayên kurd gelekî xurt be jî, ev rastî êdî tenê di dîrokê de maye. Ji aliyekî din ve lêgerînên li ser çavkaniyên fiqhê hema hema di kurmanciyê de nîn in. Vê serdemê kurdan xwe carekê spartine mezhebekê û êdî li ser bingehên hukman zêde ranewestiyane. Her wiha di nav kurdan de kesên ku li gorî hedîsan tevdigerin, ibadetên xwe li gorî hukmên hedîsan dikin tunene. Heke hebin jî ev kes demekê ji nav sînorên civakên Kurdistanê derketine û çûne nav welatên Ereban, li wan deran perwerde bûne. Bandora van Kurdên perwerdebûyî li ser civakên Kurdistanê tuneye. Ji ber ku çavkaniyên ilmî jî wekî zimanê kurdî di bin embargoya dagirkeran de ye. Encamek ji encamên dagirkeriyê yên herî xeternak pejirandina perwerdehiya wê ya olî ye. Dagirkerî dixwaze kesên di bin destan de her tim heman kirasî li xwe bikin da ku wan ji her aliyî desteser bike.

Lewre hînbûn û hînkirina bingehên fiqha îslamî gelekî girîng in. Hem ji bo şkandina dîwarên dagirkeriya yekmezheb hem jî ji bo qewirandina tecalê yekçav. Her çiqas gotineke pêşiyan dibêje

"li welatê yekçavan tu jî çavekî xwe bigire"; lêbelê ev çendsed sal e ku em û dagirker li kêleka hev an jî di nava hev de dijîn. Heke em ji çavên xwe yên heyî istifade nekin û bi xatirê dagirkeran bi çavekî li dinyayê binêrin em ê ji nêz ve bînahiya çavê xwe yê sax jî winda bikin.

Wergera berhemên hedîsê û bi taybetî hedîsên ehkamê yên ku jiyana rojane bêyî wan nameşe êdî dest pê kiriye. Em ê beş bi beş Umdetul Ehkam a Meqdisî wergerînin kurdî. Taybetiya vê berhemê ew e ku nivîskarî du sehîhên hedîsê yên navdar bingeh girtine û mijarên fiqhê ji wan hilbijartine. Piştî xwendina berhemê hûn ê jî bibînin ku xwendina hedîsên ehkamê çi aso li pêşiya we vekirine.

Hûn çiqasî bextewar in ku beriya nifşa wergêrê vê berhemê hedîsan bi kurdî dixwînin. Kesê ev werger amade kiriye ji vê zewqê mehrûm bû. Xwedê mehrûmkiriyan ji başiyên dinya û axiretê mehrûm bike û vî karê me yê ku helwesteke şkandina dîwarê mehrûmiyetê ye di deftera hesenatên me de binvîse.

Umîd Demîrhan
31.07.2012, Bazîd



PÊŞGOTINA NIVÎSKARÎ

Rehma Xwedê lê be, Şêxê Hafiz Teqiyuddîn Ebû Muhemmed Ebdulxeniyy b. Ebdulwahid b. Elî b. Surûrê Meqdisî gotiye: Pa û pesn ji bo Xwedayê ku Melik, Cebbar, Wahid û Qehhar e. Ez guwahiyê dikim ku ji bilî Ellahî xweda tunene û hevparê Wî nîn e; Ew rebê erd û esmanan û her tiştê di navbera her duyan de ye; Ezîz û Xefar e. Her wiha ez guwahiyê dikim ku Muhemmed bende û pêxemberê wî ye; neqandî û hilbijartî ye ew. Selawatên Xwedê li ser wî, malbata wî û hevalên wî yên bijarte bin

Îcar:

Hinek hevalan ji min xwestin ku hemû hedîsên ehkamê yên ku her du îmaman li ser îtifak kirine bi awayekî kurt berhev bikim. Yên îmam Ebû Ebdullah Muhemmed b. Îsmaîl b. Îbrahîmê Buxarî û yên imam Muslim b. Heccac b. Muslimê Quşeyrî yê Nîsaborî. Min jî bi hêviya menfaetê bersiv da pirsa wan û niyaza min ji Xwedê ew e ku faydeyekê jê bigihîne me, bigihîne kesê ku wê binivîse, wê guhdarî bike, wê bixwîne, wê ji ber bike û lê binêre. Her wiha niyaza min ji Xwedê ew e ku vê berhemê ji bo rizaya Xwe ya xalis qebûl bike û di ba Xwe de bigihîne bihuştên nimetan. Ew têra me dike û Ew çi berpirsekî qenc e jî.

كتاب الطهارة

١- عن عمرَ بنِ الخطاب رضي الله عنه ، قال : سمعتُ رسولَ الله صلى الله عليه وسلم يقول "إنما الأعمالُ بالنيات . وفي رواية بالنية . وإنما لكلِّ امرئ ما نوى ، فمن كانت هجرتُهُ إلى الله ورسولِه فهجرتُه إلى الله ورسوله ، ومن كانت هجرتُه إلى دنيا يُصيبُها ، أو امرأةٍ يتزوجُها ، فهجرته إلى ما هاجر إليه".

BEŞA PAQIJIYÊ

1. Umerê kurê Xetabî (r) wiha ragihandiye: Min bihîst ku Cn. Pêxember 'eleyhiselam dibêje: "*Karpêk li gorî niyetan in.* -Di riwayetekê de jî *li gorî niyetê ye- Ji mirovî re çiyê ku niyet kiriye ew*

www.arsivakurd.org



heye. Koçberiya kê ber bi Xwedê û pêxemberê Wî be, wisan e koçberiya wî kesî ji bo Xwedê û pêxemberê Wî ye. Kî jî koçberiya wî ji bo cîhaneke lê digere yan jî jineke ku pê re dizewice be, wisan e sedema koçberiya wî çi be armanca koçberiya wî jî ew e."

٢- عن أبي هريرةَ رضي الله عنه قال : قال رسولُ اللهِ صلى الله عليه وسلم : "لا يقبلُ اللهُ صلاةَ أحدِكم إذا أحدثَ حتى يتوضأ" .

2. Ebu Hureyreyî (r) ragihandiye ku Cn. Pêxember 'eleyhiselamî wiha gotiye: *"Gava destnimêja we şkestibe heta ku hûn cardin destnimêj negirin Xwedê Teala nimêja kesekî we napejirîne."*

٣- عن عبدِ اللهِ بنِ عمرِو بن العاص وأبي هريرة وعائشة رضي الله عنهم ، قالوا : قال رسول الله صلى الله عليه وسلم «ويلٌ للأعقابِ من النارِ» .

3. Ji Ebdullah b. Emr b. As, Ebû Hureyre û 'Aişeyê (r) hatiye ragihandin ku gotine: Cn. Pêxember 'eleyhiselamî wiha gotiye: *"Delîl li halê wan paniyan be ku dê bikevine êgir."*

٤- عن أبي هريرةَ رضي الله عنه ، أنَّ رسولَ الله صلى الله عليه وسلم قال : «إذا توضأ أحدُكم ، فَلْيَجْعَلْ في أنفه ماء ثم لْيَنْتَثِرْ ، ومن استجمر فليوتِر ، وإذا استيقظ أحدُكم من نومه فَلْيَغْسِل يَدَيْهِ قبل أن يدخلَهُما في الإناءِ ثلاثاً ، فإن أحدَكم لا يدري أين باتت يدُهُ».

وفي لفظ لمسلم : «فَلْيَسْتَنْشِقْ بمنخَرَيْه من الماء».

وفي لفظ «من توضأ فَلْيَسْتَنْشِقْ».

4. Ebu Hureyreyî (r) ragihandiye ku Cn. Pêxember 'eleyhiselamî wiha gotiye: *"Gava kesekî we destnimêj girt, bila avê hilçine bêfila xwe û paşê jî lê werde. Kî paqijiya xwe bi keviran bike, bila her di hejmara kit de raweste. Gava kesekî ji we ji xewa xwe hişyar bû, berî ku rahije amanekê bila destên xwe sê caran bişo; ji ber ku dema kesekî ji we radize êdî ew pê nahese bê ka destê wî li kê derê digerin."*

Di riwayeteke Muslimî de: *"Bila avê hilçine her du kulfikên bêfila xwe."*

Di riwayetekê de jî: *"Kî destnimêj digire bila avê hilçine bêfila xwe jî."*

٥- عن أبي هريرةَ رضي الله عنه ، أنَّ رسولَ اللهِ صلى الله عليه وسلم

www.arsivakurd.org

قال : «لا يبولَن أحدُكم في الماءِ الدائمِ الذي لا يجري ، ثم يَغْتَسِل منه» .

ولمسلم : «لا يَغتسلْ أحدُكم في الماءِ الدائمِ وهو جُنُبٌ» .

5. Ebu Hureyreyî (r) ragihandiye ku Cn. Pêxember ‘eleyhiselamî wiha gotiye: *“Bila ji we kesek di ava rawestiyayî ya ku nakişe de mist neke û paşê jî pê xwe neşo.”*

Di riwayeta Muslimî de: *“Bila ji we tu kesê cinabet di ava rawestiyayî de serê xwe neşo.”*

٦- عن أبي هريرة رضي الله عنه ، أنَّ رسولَ اللهِ صلى اللهُ عليه وسلمَ قال : «إذا شَرِبَ الكلبُ في إناءِ أحدِكم فَلْيَغْسِلْهُ سبعاً» .

ولمسلم «أولاهُنَّ بالترابِ» .

6. Ebu Hureyreyî (r) ragihandiye ku Cn. Pêxember ‘eleyhiselamî wiha gotiye: *“Gava segî çelpande amana yekî ji we, bila wê heft caran bişo.”*

Di riwayeta Muslimî de: *“Bila şûştina yekem digel xweliyê be.”*

٧- وله في حديث عبد الله بنِ مُغَفَّلٍ ، أنَّ رسولَ اللهِ صلى اللهُ عليه وسلم قال «إذا وَلَغَ الكلبُ في الإناءِ ، فاغسلوه سبعاً ، وعَفِّروه الثامنةَ بالترابِ».

7. Di ragihandina wî ya ji hedîsa Ebdullah b. Muxeffelî de Cn. Pêxember ‘eleyhiselamî wiha gotiye: *“Gava segî çelpande amanê, wê amanê heft caran bişon û caran heştan jî xweliyê tehfîr bikin.”*

٨- عن حُمْرانَ . مولى عثمانَ بنِ عفانَ . رضي الله عنه ، أنه رأى عثمانَ رضي الله عنه دعا بوَضوءٍ ، فأفرَغَ على يدَيْه من إنائه ، فَغَسَلَهُما ثلاثَ مراتٍ ، ثم أدخلَ يمينَه في الوَضوءِ ، ثم تمضمضَ ، واستنشقَ ، واستنثرَ ، ثم غسل وَجْهَهُ ثلاثاً ، وَيَدَيْه إلى المِرْفَقَيْنِ ثلاثاً ، ثم مسح برأسِه ، ثم غسل كلتا رِجْلَيْه ثلاثاً ، ثم قال : رأيتُ النبيَّ صلى الله عليه وسلم ، توضأ نحوَ وُضوئي هذا ، وقال : «من توضأ نحوَ وُضوئي هذا ، ثم صلى ركعتين لا يُحَدِّثُ فيهما نفسَه ، غَفَرَ اللهُ لَهُ ما تقدمَ من ذنبِه» .

8. Ji Humranê -koleyê Usman b. Effanî- (r) hatiye ragihandin: Wî dîtiye ku Usman aveke destnimêjê xwestiye. Ji amana hatî av rijandiye ser destên xwe û sê caran ew şûştine. Paşê destê xwe yê rastê di ava destnimêjê de kiriye. Paşê av li devê xwe werdaye, av hilkişandiye bêfila xwe û bêfila xwe paqij kiriye. Paşê sê caran rûyê xwe şûştiye û sê caran jî milên xwe hetanî enîşkan. Paşê serê xwe mesh kiriye û paşê jî her du piyên xwe şûştine. Piştre wiha gotiye: Min dît ku Cn. Pêxember ‘eleyhiselamî wekî vê destnimêja min destnimêjek girt û wiha got: *“Wekî vê destnimêja min kî destnimêjekê bigire, bêyî ku tê de ji xwe re biaxive du rikatan bike, Xwedê Teala dê gunehên wî yên bihurî bibexşîne.”*

www.arsivakurdi.org



Warê Îmtihanê

MURAD CELALÎ
muradcelali@gmail.com

Ev dunyaya warê îmtihanê, ji bo hemû mirovan zeviya çandinê ye. Hemû kes di tûrê wan de çi hebe di vê zeviya fireh û bi adan de diçînin. Di roja axretê de gava ku mirovahî derkete pêşberî rebbê xwe û li wê derê ji bo xelat û celatê mêzîn hat danîn dê berhemên xwe biçinin. Mirov li vir, li ser vî erdê ava û adan çi karî bike, jiyan û xebata xwe di rêya çi de bidomîne, ewê li wê derê derkeve pêşiya wî û jê re bibe hevgel. Ji bo em bikaribin 'cila xwe ji avê derxin' li wî warê ku êdî firsendeke duyem a ji bo poşmanî û xebatê tuneye rûreş nebin, serê me nekeve ber me, divê îro, hema nika -ango nebêjin sibê, dusibê ezê bikim- dest pê bike, jiyana xwe di ber çavê xwe re derbas bike û hê ku milyaketê mirinê lê me nebûye mêvan muhesebeya xwe bikin. Bi vê mebestê emê sê bûyerên balkêş û têrşîret li vir parve bikin.

www.arsivakurd.org

Mêvanê Qasidê Xwedê, Cebarîl

Ji Ebû Hefs Umer bîn Xettab (r) hatiye ragihandin ku wiha gotiye:

"Rojekê em li cem Qasidê Xwedê (s) runiştî bûn, ji nişkê ve merivekî kincên çîlsipî lê, porê wî reşqîr, tu elametên rêwîtiyê li ser xuya nedikirin û ji me kesî ew nas nedikir derket hat. Li hinda Qasidê Xweda (s)



rûnişt, çongên xwe siparte çongên wî, kefa destên xwe da ser hêtên wî paşê got:

-Ya Mûhemmed! Ji min re behsa Îslamê bike?

Qasidê Xweda (s) got:

-Îslam; ew e ku tu şehadetê bînî xêncî Xwedê tu îlahê layiqê îbadetê tuneye, Muhemmed (s) bende û Qasidê Xwedê ye, nimêj bikî, zikatê bidî, rojiya remezanê bigirî û heke taqeta te bigihêjê heca beytê bikî.

(Meriv) got:

-Te rast got.

Em lê şaş û metel mabûn, hem pirs dipirsîn hem jî rast didêrand! Paşê got:

- Ji min re behsa Îmanê bike?

Qasidê Xweda (s) got:

-Îman; ew e ku tu bi Xwedê, bi milyaketên wî, bi kitêbên wî, bi pêxemberên wî, bi roja dawiyê, bi qederê ku xêr û şer ji Xwedê ye bawer bikî.

(Meriv) got:

-Te rast got. Paşê got:

- Ji min re behsa Îhsanê bike:

Qasidê Xweda (s) got:

-Îhsan; ew e ku wekî tu Xwedê (bi çavên xwe) dibînî ji wî re îbadetê bikî, (lewra) her çendî tu wî nabînî jî ew te dibîne.

(Meriv) got:

- Ji min re behsa wextê qiyametê bike?

Qasidê Xweda (s) got:

-Di vê mijarê de yê pirs lê tê kirin, ji yê ku dipirse zanatir nîne.

(Meriv) got:

- Ji min re behsa elametên qiyametê bike?

Qasidê Xweda (s) got:

-(Ew e ku) tu bibînî qerwaş xwediyê xwe biwelidîne û şivanên pêxwas, tezî û feqîr di çêkirina avahiyan de pêşpaziyê bikin.

Hz. Umer (r) dibêje:

-Paşê ew meriv rabû çû. Xêlekê ma û paşê Resulullah (s) got:

-Ey Umer! Tu dizanî yê pirs dipirsî kî bû?

Me jî got:

-Xweda û Qasidê wî çêtir dizane:

Qasidê Xweda (s) got:

-Ew Cibrîl bû. Ji bo ku dînê we hînî we bike hat."[1]

---

1 Mislim ragihandiye. Di *Çil Hedîsa* Îmam Newewî de hedîsa duduyan e.

www.arsivakurd.org

Ji Pêşengên Misilmanan Sufyanê Kurê Uyeyne

Sufyanê Kurê Uyeyne ji giregirên tabiînan e. Rojêkê li ser rê pêrgî Emrê kurê Dînar tê. Wê hingê Sufyan hê zarekî deh salî ye. Emr dixwaze nimêj bike, lê heywana ku lê siwar bûye li cem e. Sufyan tê hinda Emrê kurê Dînar û jê re wiha dibêje:

- Ma tu dixwazî ez heywana te bigrim, heya ku tu nimêj bikî? Dibe ku heywana te bireve here û paşê tu nikaribî wê bigrî.

Emrê kurê Dînar dibêje:

- Baş e, lê ji bo vê tu yê çi heqî ji min bixwazî.

Sufyan dibêje:

- Ez dixwazim di ber vî karî de heşt hedîsan bi tevî senedên wan ji te seh bikim û ji ber bikim. A ev destheqê min e.

Emrê kurê Dînar bi devkenî dibêje:

- Ka tu dikarî vê bikî?

Sufyan jê re dibêje:

- Çawa ez nikarim, bi yeqîn ez vê dikarim.

Axir Emrê kurê Dînar, heşt hedîs bi senedên wan jê re got û ji bo nimêjê çû mizgeftê. Sufyanê deh salî jî dest bi jiberkirina wan heşt hedîsan kir. Dema ku Emr nimêj kir û hat heywana xwe bibe ji Sufyan re got:

- Te hedîs çawa kirin?

Sufyan got:

- Min hemû ji ber kirin, hezkî bi tevî senedên wan ji te re bibêjim.

Emrê kurê Dînar keniya û got:

- De bibêje.

Sufyan dest pê kir heyşt hedîs bi tevî senedên wan xwend. Gava Emr ev zîrekî û baqiliya Sufyan dît, ecêbmayî ma û jê re wiha dua kir: "Xwedê wana ji te re bi xêr û bêr bike."

Gelek sal di ser vê bûyerê re derbas bûn, Sufyanê kurê Uyeyne mezin bû, bû alim û seydayekî hêja. Rojekê gava ku li mizgeftê ders dida, xortek hate bal û got ez dixwazim dersê li ber destê te hildim. Yên li wir xwestin ku wî xortî ji wir derxin. Lê Sufyan rê neda vê, got bihêlin bila were. Çaxê xort hate hindê, jê re got: Berê em jî mîna te bûn, em jî nezan bûn, me jî dihat alîkarî ji ehlê ilm dixwast û ew li tehêla xwe da runiştandin.[1]

1 Said Özdemir, Önüm - zü Aydınlatan Meşaleler, s. 57.



www.arsivakurd.org

Xort

Îbn Kesîr di pirtûka xwe ya dîrokê *el-Bîdaye we Nihaye*yê de qala xortekî dike:

Wextekî xortek hebû, Quran hemû ji ber kiribû û tevî Misilmanan derdikete cîhadê. Ji nav mucahidan de kesê herî hêja, ji wan re Quran dixwend, nimêj bi wan dida kirin û ilmê xwe hînî wan dikir, ew bû. Artêşa Misilmanan gelekî ji vî xortî hez dikir.

Carekê dema hatin ber keleha Rûman, ew dorpêç kirin, li der û dorê kelehê konê xwe vegirtin. Ev xort jî seba karekî ji nav konan derket çû. Gava li hawirdorê kelehê digeriya çav bi keçeke Fileh ket. Zûr bû bala xwe da wê, li wê nihêrî. Keçikê jî li wî nihêrî. Lê ev ayeta pîroz nehate bîra vî xortê Quranxwên:

"Mêrên mumin re bêje! Bira çavên xwe (ji mêzekirina heramiyan re) bigrin, ciyê xwe nê şermî veşêrin/ biparêzin. Ev ji bo wan paqijtir e. Bi rastî Xwedê bi kirinên wan agahdar e." (Sûretê Nûr: 30)

Belê, vî xortê hingî li wê keçikê mêze kir, dilê wî kete wê û paşê çû pê re xeberda. Ji keçika Fileh re got: Ezê çawa xwe bigihînime te? Keçikê got: Tu bibî Fileh, tu yê xwe bigihînî min. Li ser vê ew xort, çû li dergehê kelehê xist û ji wan re got: Ez ji ser dînê Îslamê hatime ser dînê Xaçparêziyê.

Li hêla din ew Misilmanên ku li der û dora kelehê kon vedabûn, gava dîtin ku ew xort wenda bûye, geriyan negeriyan ew peyda nekirin. Xemgîniyê konê xwe avêtibû ser wan. Gelekî li ber wî ketin. Gotin yan Rûman ew dîl girtin û yan jî ew kuştin. Piştî demekê Misilmanan dorpêç rakirin, bi xemgînî û fikar vegeriyane welatê xwe.



Salekê şûnde Misilman dîsa hatin heman kele dorpêç kirin. Konên xwe li tehêla kelehê vegirtin. Lê nihêrîn ku ew xortê ku nimêj bi wan dida kirin, Quran hemû ji ber kiribû, li ser keleha Rûman e, berê çeka xwe zivirandiye Misilmanan û notirvaniyê dike. Hem jî di sefê Rûman, Filehan de... Misilmanan berê xwe dane wî û gazî kirinê, gotin:

-Filan keso!

Wî xortî jî li wan nihêrî.

-Çi bi te hat? Nimêja te, Qurana te û emelên te yên salih çawa bûn?

Wî jî weha bersîva wan da:

-Min hemû Quran ji bîra kir. Lê ev ayeta han tu car ji bîra min naçe:

"Ewên kafir dê gelek caran bixwazin (û bibêjin xwezî em jî) bibûna Misilman." (Hicr: 2)

www.arsivakurd.org

Elî Herîrî*

Dîsan ji nû işqa berî pur-enderûnim ateş e
Zulfa muzeyyen 'enberî de'wa tigel xala reş e

Xala li dêmê dil reva sed rûh û canim bin feda
Sotim gelo çum tê nema terkim kirin eql û huş e

Eql û huşim bûne esîr dinya ku geh geh tête bîr
Dêm şubheta bedra munîr zulfa ji werdê bênxweş e

Werdan ji nêv zulfan derîn şu'la binefşî tê werîn
Bala û qedda 'er'erîn her yan li ser marê reş e

Dîsanê hey têt û teçît îhyayî emwatan tebît
Wechan mudam nûr jê teçît dêm şubhetê şem'a geş e

Şem'a şebistanan ew e werda gulistanan ew e
Sirrê tebistanan ew e şoxa Herîrî dilgeş e

'Ecîb letîf û cindî ye ezman nezan û Rûmî ye
Ageh ji eşqbazan niye mest û xumar û serxweş e

Serxoşê cama şerbetê dêm şubhê şem'a zulmetê
Hûriya d'baxê cinnetê serdara çendîn mehvveş e

Mehweşê ku westan sef be sef ew hate der Misrê ti kef
Wan got Eliyo la texef meb'mirdinê qewî xweş e

www.arsivakurd.org

Qisseya Hezretî Yûsuf û Girîngiya Wê

CELÎL CEWHER

Qur'ana pîroz, ji bo ku ji mirovan re bibe rêber, ji teref Xwedê ve hatiye şandin. Di Qur'anê de ji bo mirovan gelek hîkmet û rehmet hene. Ji ber vê sedemê jî Qur'ana pîroz gelek muhîm û girîng e ku divê mirov bixwîne û ji xwe re bike rêber da ku jê gelek xêr, fêde û bereketê wergire.

Di Qur'anê de ji xeynî hukmên Xwedê, ji bo mirovahiyê jî gelek hikmet û rehmet hene ku deriyê xêr û xweşiyê ji wan re vedike. Tenê divê em Qur'anê bixwînin, em jê baş fêm bikin ku em hukm û hîkmetê Xwedê baş bizanibin.

Di Qur'anê de beşên li ser jiyana pêxemberên Xwedê gelekî cîh digirin. Qisseyên pêxemberên Xwedê ku di Qur'anê de derbas dibin, hem ji bo meseleyên îmanî û hem jî ji bo meseleyên civakî gelek mesajan didin me û rêberiya me dikin. Eger mirov van mesajan baş fêm bike, wê bi rêberiya van mesajan di rêya Xwedê baş bimeşe û di jiyana xwe ya şexsî û civakî de jî bi îzn û qeweta Xwedê, wê di daîreyek meşrû de tevbigere û jiyana xwe tenzîm bike.

Belê, qisseyên hemû pêxemberên Xwedê ku di Qur'anê de derbas dibin xwedî ehemmiyet û xusûsiyetekê ne. Di nav van qisseyan de qisseyek heye ku wekî hemû qisseyan gelek xusûsiyetan di xwe



www.arsivakurd.org

de dihewîne. Ev qisse, qisseya Hezretî Yûsuf e. Ev qisse bi kurtasî di Qur'anê de wiha derbas dibe.

Hezretî Yûsuf dema ku hê zarok e, xewnekê dibîne û vê xewna xwe ji bavê xwe Yaqûp elehîsselam re dibêje. Hezretî Yûsuf di xewna xwe de dibîne ku deh stêrk û roj û hîv jê re secdeyê dikin. Hezretî Yakûp xewna wî şîrove dike û dibêje vê xewna xwe ji birayên xwe re nebêje. Ji ber ku bavê wan herî zêde ji Yûsuf hez dike, birayên Yûsuf li hemberê Yûsuf hesûdiyê dikin û jê gelekî aciz in.

Birayên Hezretî Yûsuf bavê xwe îqna dikin û Yûsuf bi xwe re dibin çolê û wî diavêjin bîrê. Ji bavê xwe re jî dibêjin ku gur Yûsuf xwariye. Piştre dizivirin tên ser bîrê û Yûsuf bi buhayek erzan difiroşin karwanekî. Karwan Hezretî Yûsuf bi xwe re dibe Misrê û li vir ji aliyê Ezîzê Misrê ve wek kole tê stendin. Hezretî Yûsuf li vir, di xizmeta wî de dimîne û mezin dibe.

Hezretî Yûsuf xwediyê xweşikiyeke bêemsal e, ji ber vê xweşikiya bêemsal jina Ezîzê Misrê, Zuleyxa çav berdide Hezretî Yûsuf, lê Yûsuf hemû teklîfên wê red dike. Rojekê Zuleyxa diçe odeya wî û dîsa lê teklîf dike. Hezretî Yûsuf teklîfa wê dîsa red dike û jê direve. Dema ku ji Zuleyxayê direve îşlikê wî ji paşve diçire. Dema ku Yûsuf direve û ji odeyê derdikeve, li ber derî rastî Ezîz tê. Zuleyxa dibêje ku Yûsuf êrîşî min kiriye û Yûsuf davêjin zîndanê.

Hezretî Yûsuf di zîndanê de xewnên koleyan şîrove dike û hemû şîroveyên wî rast derdikevin. Piştre xewna hikumdarê Misrê jî şîrove dike û ew jî rast derdikeve. Hezretî Yûsuf ji zîndanê derkive û dibe Ezîzê Misrê.

Hezretî Yûsuf piştî ku dibe Ezîzê Misrê zîraetê pêşve dibe û li hemberê xelaya ku heft sal didome zexîre depo dike û wekî ku di xewna hikumdar de derbas dibe xela dest pê dike. Birayên Hezretî Yûsuf jî ji ber ku xela radibe ji diyarê Kenanê ji bo ku zexîre bigirin tên Misrê. Hezretî Yûsuf lîstikekê li wan dike ku birayên wî cardin bên zexîreyê bibin û birayê xwe Bunyamîn jî bi xwe re bînin. Qisse ji vir bi şûn de bi kurtasî wiha dom dike: Hezretî Yûsuf xwe bi birayên xwe dide naskirin û bi birayên xwe re îşlikê xwe ji bavê xwe re dişîne û çavên wî vedibin. Piştre hemû malbat tên Misrê û li wir dijîn.

Em ji vê qisseyê dikarin ji xwe re çi dersan bigirin?

Hesûdî mirovan dixe çi halî. Ew hesûdî bû ku qelbê birayên Yûsuf dagir kir û Yûsuf birin avêtin bîrê. Nefis tim



nebaşiyê emir dike, ew nefis bû ku Zuleyxa xiste wî halî. Divê mirov li himberî bûyeran hêrs û nefretê hîs neke, çimkî di van bûyeran de ji bo mirovan gelek hîkmet hene. Helbet dema ku birayên hezretî Yûsuf ew avêtin bîrê û piştre ew firotin karwanekî, Hezretî Yûsuf tenê xwe sipart Xwedê û dizanîbû ku wê tenê Xwedê wî biparêze û helbet di vir de jî hîkmetek hebû. Di zîndanê de ew sebir bû ku Hezretî Yûsuf xwe siparte Xwedê, sebrê nîşan da ku Xwedê mikafat da wî û ew bû hukimdarê Misrê. Ketin û rabûn di destê Xwedê de ye, divê mirov bizanibe ku ev dinya ciyê îmtihanê ye û divê em sebrê nîşan bidin. Çimkî Hezretî Yûsuf bi sebra xwe û bi sipartina xwe ya Xwedê ji tengasiyan rizgar bû. Hêvî tim Xwedê ye.

Bêguman di hemû ayetên Xwedê de hîkmet hene, rehmet heye. Xwedê me li himberê zor û zehmetiyên vê dinyayê û ji koletiya nefsa me biparêze.

www.arsivakurdi.org

Ji Munebbîhata Îbnul Hecerê Esqelanî: Wesfên însanên qenc û yên xerab

Ji Erebî: Mela Emînê Botikî

Ebûhureyre (r) ji Pêxember (s) wiha rîwayet dike: "Heft kes hene ku Xwedê teala di roja qiyametê de wan di bin siya erşê Xwedê bi cih dike ku ji xeynî sîya erşê wî qet sî tuneye. Serokê adil. Ciwanekî ku bi îbadeta Xwedê mezin bibe. Kesekî ku di ciyekî tenha de Xwedê bîne bîra xwe û ji tirsa Xwedê ji çavê wî hêsir birijin. Kesekî ku qelbê wî bi mizgeftê ve girêdayî be heta ku dîsa here mizgeftê. Kesekî dema ku bi destê rastê xêrekê bike, nehêle destê çepê pê bihese. Kesê ku ji bo Xwedê ji hev hez dikin. Zilamekî ku jineke xweşik di ciyekî bêkes de daxwaziya bihevrebûnê lê dike, lê ew ji tirsa Xwedê vê daxwaziyê nepejirîne."(Buxarî: 1423. Mislim:1031)

Ebûbekirê Sidîq (r) gotiye: "Kesê qesîs, ji van heft tiştan vala nabe: Yan wê bimire û kesên ku malê wî belav bikin wê jê re bibin waris û di ciyê ku Xwedê ferman nekiriye serf bikin. Yan siltanekî (rêvebirekî) zalim, piştî ku heqaretê jî lê bike wê mal ji destê wî derêxe.Yan wê li dûv şehweta xwe here û di vê rêyê de serf bike. Yan di ciyekî vîrane de wê avahiyekê çêbike û di wir de serf bike. Yan hinek belayên wekî xeniqînê, şewitînê û diziyê wê werin serê wî û wê ev malê wî tune bibe. Yan wê nexweşiyeke domdar lê peyde bibe û wê vî malî di dermankirina xwe de serf bike. Yan wê di ciyekî de veşêre piştre jî ciyê veşartinê jibîr bikê û nebîne."

Îmam Umer (r) wiha gotiye: "Kesê ku pir bikene, heybeta wî kêm dibe. Kesê ku mirovan biçûk bibîne, wê ew jî biçûk were dîtin. Kesê çi pir bike, wê bi wê were naskirin. Kesê pir biaxive, wê pir bişemite. Kesê ku fêhtiya wî kêm be, wê teqwa wî jî kêm bibe. Kesê ku teqwa wî kêm bibe, dê qelbê wî bimire."

İmam Elî (r) di şîrova ayeta "Di bin (dîwari de) xezîneyeke wan hebû. Dê û bavê wan jî qenc bûn." Wiha dibêje: Ew xezîne lewhek ji zêr bû û li ser lewheyê ev heft rêz hatibûne nivîsandin: Di yekê ji wan de ev nivîsandin hebû: Ez ecêb mam ji wî kesê dizane ku mirin heye û dikene. Ez ecêb mam ji wî kesê dizane ku dinya fanî ye û jê re daxwaz e. Ez ecêb mam ji wî kesî dizane ku gişê tiştan bi qederê ye, lê dema ku tiştekî bidest nexe xemgîn dibe. Ez ecêb mam ji wî kesê ku dizane hesabdayîn heye, lê mal dicivîne. Ez ecêb mam li wî kesê dizanê ku dojeh heye, lê gunehan dike.

www.arsivakurd.org

Ez ecêb mam li wî kesê ji dil dizanê ku Xwedê heye, lê kesên ji xeynî wî tîne bîra xwe. Ez ecêb mam ji wî kesê ji dil dizane ku bihişt heye, lê bi dinyayê rehet dibe. Ez ecêb mam ji wî kesê ku Şeytan nas kiriye, lê belê îtaeta wî dike."

Ji Îmam Elî (r) hatiye pirskirin: "Çi ji ezmana girantir e? Çi ji erdê firehtir e? Çi ji deryayê dewlemendtir e? Çi ji kevirî hişktir e? Çi ji agirî germtir e? Çi ji zemherîrê cemidîtir e? Çi ji jehrê tehltir e?" Îmam Elî wiha bersiv daye: "Bêbextiya li mexlûqan ji ezmana girantir e. Heq, ji erdê firehtir e. Qelbê kesê bi qeneat ji deryayê dewlemendtir e. Qelbê minafiqan, ji kevirî hişktir e. Siltanê zalim, ji agirî germtir e. Hewcebûna bi bal kesê lomekar ji zemherîrê cemdîtir e. Sebirkişandin ji jehrê tehltir e. Hatiye gotin ku seb jî ji jehrê tehltir e."

Pêxember (s) wiha ferman dike: "Dinya ciyê kesê bêcî ye û malê kesê bêmal e, kesê eqlê wî nebe jê re mal dicivîne. Kesê fêmkirina wî nebe bi dinyayê meşxûl dibe. Kesê ilmê wî nebe ji bo dinyayê tê cezakirin. Kesê mijiyê wî nebe ji bo dinyayê hesûdiyê dike. Kesê bêbawerî bi bal ve dilezîne."

Cabirê kurê Ebdullahê Ensarî ji Pêxember (s) wiha rîwayet kiriye: "Cebraîl di mafê cîranan de li min wisan wesiyet kir min texmîn kir ku cîran wê bibe warisê cîranî. (Buxarî). Di mafê jinan de li min wisan wesiyet kir, min texmîn kir ku berdana wan heram e. (Îbnî Mace, Ebûdawud, bi peyvên cuda). Di mafê ebdan de li min wisan wesiyet kir min texmîn kir ku wê rojekê kifş bike û wê bêje bila gişê ebdan werin azadkirin. (Mislim, Buxarî, bi peyvên cuda). Der heqê sîwakê de wisan li min wesiyet kir ku min texmîn kir sîwak ferz e. (Mislim, Buxarî, bi peyvên cuda). Di heqê nimêja bi cemaet de li min wisa wesiyet kir min texmîn kir ku Xwedê nimêja bê cemaet napejirîne. (Mislim, Buxarî, bi peyvên cuda). Di heqê nimêja şevê de li min wisa wesiyet kir min texmîn kir ku di şevê de xew tuneye. (Mislim, Buxarî, bi peyvên cuda). Di mijara zikrê Xwedê de wisa li min wesiyet kir; min texmîn kir ku bê zikir fêda tu axaftinan tuneye.(Tirmizî, bi peyvên cuda)

Pêxember (s) wiha gotiye: "Heft kes hene roja qiyametê afirîner (Xwedê) li wan nanêre, wan paqij nake û dê wan bixe dojehê: Kesê ku lîwatê dike û kesê ku lîwate pê tê kirin. (Beyheqî, Şuebu'l-Îman, 5075) Kesê ku bi destê xwe xwe xera (cenabet) dike. Kesê bi heywanan re zewacê dike. (Beyhaqî, bi peyvên cuda) Kesê ji paş ve bi jinan re zewacê dike. (Tirmizî, bi peyvên cuda) Kesê bi hev re bi dê û keçê re dizewice. Kesê ku bi jina cîranî re zînayê dike. (Buxarî, tewhîd) Kesê ku eziyetê dide cîranê xwe heta lanetê lê dike." (Mislim, Birr, bi peyvên cuda)

Pêxember (s) wiha ferman dike: "Ji xeynî kesê ku di riya Xwedê de hatiye kuştin heft kesên din jî şehîd in: "Yê yekem, kesê bi zikêş û zikçûnê miriye. Kesê xeniqiyê, kesê bi nexweşiya zatulcenbê miriye. Kesê bi webayê miriye. Kesê şewitî. Kesê di bin tiştekî herifî de bimîne. Pîreka ku bi zarokê bimire." (Îmam Malik, Muwetta, 702. Ebûdawud, 3111. Nesaî, 1846 Nesaîhu'l-Îbad:138)

Ji îbnî Ebbas (r) hatiye rîwayetkirin wiha dibêje: "Li ser kesê bihiş wacib e ku heft tiştan di ser heft tiştan re bigre: Feqîriyê li ser dewlemendiyê, jiyaneke bêdeng li ser jiyaneke bi nav û deng, nefsbiçûkiyê li ser quretiyê, birçîbûnê li ser têrbûnê, xemgîniyê li ser kêfxweşiyê, nizimbûnê li ser bilinbûnê û mirinê li ser jiyanê.

www.arsivakurd.org

Melayê Bateyî

Mûhemmed seyyidê alem şefi'ê roja mîzanê
Çiraxê dîdeê Adem xudanê wehy û Furqanê

Xudanê wehy û tenzîlê bi eqlam bi tebcîlê1
Qelem da nesxê Încîlê nema Tewrat û xeclanî

Çe Încîl û çe Tewrat in di mensûx in di mulxat in
Bi wî navî misemmat in hukim çû kenzê rehmanî

Bi hukmê seyyidê mursel nebiyê axir û ewwel
Betal kir dînha mucmel bi ayat û bi Qur'anê

Bi ayat bi tewhîdê ji teşrîfê û temcîdê
Şeva xurrem di tewlîde senem hûr bûn di Ticanê

Nigûn ser bûn senem aciz ji tewlîda gula qurmiz
Bi Kesrayê geha mu'ciz tezelzul kefte eywanê

Bûye mizgîn di dinyaye şikufte wird re'nayê
Ji baxê Îstefeynayê Qureyşî eslê însan î

Qureyşî bû penahê dîn xudanê sûreê Yasîn
Şivanê kûdekê nûrîn melek hatin di fermanê

Melek hatin bi te'cîlê du şeq kir sîne Cibrîlî
"Elem neşreh" tê tenzîl dikit tewzih û tibyanî

Xudanê text û "lewlakê" siyarê heft eflake
Li erş merkeza xak e ji bo wî hate kêşanê

Ji bo wî çebû ev alem nebî bû hêj berî Adem
Ti îxbarî wekû xatem çiraxê ehle îmanê

Çiraxê rohniya ummet ji bo çî tu bûyî xilqet
Fetahê dergehê Cennet emîrê sedre dîwanê

---

1 Wiha hatibû "bi tecmîl"

www.arsivakurd.org

Emîrê textê uqbayê siha wî darê tûbayê
Xuzî carek li dinyayê bidîta min tu wî anê

Tu anî û hînî bû dilim muştaqê dînê bû
Le rêgayê Medînê bû Resûlê Haşimî kanê

Resûlê Haşimî sabir hemîş "Taha" hemîş haşir
Dil û canê me bû agir ji nar û pêtê hicranê

Çi nar û pêtê da ser me evîna te qewî germ e
Du çavan tê bikim surme ji toza rewzê astanê

Ji toza wê derazînê dikim feryad û nalînê
Xudê çêkit di wê hînê wîsala lutf û îhsanê

Wîsala seyyidê ehbab qudayê minber û mihrab
Muyesser bin li min esbab me can havête meydanê

Me can bada fîdayê te tenim xaka serayê te
Ziban weqfa senayê te dilê min 'ebdê fermanê

Dilim qendîla rewzê bit lebim nezdîkî hewzê bit
Ji ehlê sidq û fewzê bit ez im muhtacê xufranê

Du alem pêkve muhtacê ji bo wan hatî îxracê
Şeva ew çûye mî'racê çi xulxul kefte eywanê

Çi xulxul hate ez xebra sedayê Gunbeda Xedra
Ke "subhane'l lezî esra" ji Qudsê çûye dîwanê

Ela ey seyyidê sefwet tu roja heşr û pur fitnet
Be tîjêd ummiyê ummet fikende ser û çokanê

Fikende ser biya derbey dikim hêvî ji mîrê hey
Şefa'et kî ji bo Batey bide ber zillê sîwanê

www.arsivakurd.org

Sê Çîrokên Bi Hîkmet

M. XALID SADÎNÎ

Bibe mirovekî baş

Dibêjin, mirovekî pirzana û xwendevan li gundekî hebûye. Vî camêrî bi dolaban pirtûk jî hebûne. Her çi kesê diçû mala wî di bin tesîra xweşmirorovî û xwendevaniya wî de dima, herwisa di bin tesîra zêdebûna pirtûkên wî de jî dima. Were rojê, here zeman, carekê ji caran gundiyekî bi xwe zana, zanyarê nexwendî jî çûye mala wî zanayê xwedî pirtûk. Zanyarê gundî çawa ku dîtiye pirtûkên wî alimî pir in, xwestiye ku pirsekê jê bike. Alimê me jî destûr dayiyê û gundiyê me jî wiha gotiye alim:

-Ezbenî te ev pirtûk tev xwendine?

-Birawo, wele min tev nexwendine. Lê min hin xwendine, hinan dixwînim û ez dê yên din jî bixwînim heke Xwedê hez bike...

-Hmm... demek wisa... Baş e tu dizanî ku ev pirtûk hemî çi dibêjin?

-Bira, ezê feqîr çawa bizanim ev pirtûk hemî çi dibêjin. Min hê ji nêvî zêdetir nexwendine. Ezê çawa bizanim?

-Hmm demek wisa tu nizanî... ha... Belê ez dizanim ka ev pirtûk hemî çi dibêjin. Bila min yek bi tenê jî nexwendibe, bes dîsa ez dizanim ka çi dibêjin...

-De ka bêje madem wisa ye, ev pirtûk hemî çi dibêjin?

-Ezbenî ma ev pirtûk hemî pêkve nabêjin: Bibe mirovekî baş? Yanî pirtûk hemî dibêjin: "Bibe mirovekî baş." Ne wisa ne?

-Seddeqna, belê wisa ye. Hemî pirtûk dibêjin: "Bibe mirovekî baş."

www.arsivakurd.org

Her kes digihê heqê xwe

Dibêjin mîrekî bexçeyekî pir xweş û rind hebûye û bexçevanekî zîrek, hişyar û baxzan jî girtiye. Di nav baxçe de cihê gulan hebûye û gulek ji hemî gulan gihîştî rojekê ji aliyê bilbil ve hatiye werandin. Dema baxvan wê gulê wisa werandî dibîne pir xemgîn dibe, dixwaze ku bilbil bikeye, lê ji tirsa mîr tiştekî nake.

Mîr jî her rojê çend deqîqeyan tê nav baxçê xwe û digere. Nabêjî mîr jî ji vê yekê agahdar bûye. Wê roje gulê nabîne. Ji baxvan dipirse ku çi li gulê hat? Baxvan dibêje:

-Mîrê min, bilbil ew gul werand, lê tu mereqê neke dê bilbil jî rojekê cezayê xwe bibîne.

Mîr serê xwe dihejîne, diponije û diçe tana karê xwe. Çend roj derbas dibin, marek li baxçê peyda dibe û rojekê xwe li gewriya bilbil dide û dadiqurtîne. Baxçevan çawa dibîne ku bilbil di devê mar de ye, mirekê li stûyê mar dide û dikuje.

Mîr mirina bilbil û kuştina mar ji baxçevan dibihîze û dibêje baxçevan: "Tu jî dê rojekê cezayê xwe bibînî..."

Were roj here roj û zeman rojekê carekê baxçevan jî sûcekî dike û dibin mehkemê. Mehkeme cezayê kuştina wî dide, lê her tişt di destê mîr de ye. Baxçevan jî vê çendê dizane. Di dawiya mehkemê de dibêje:

-Mîrê min tê bîra we dema ku bilbil gula me werand min gotibû: "Bilbil dê cezayê xwe bibîne." Belê bilbil cezayê xwe dît û marî ew xwar. Piştî marî ew xwar min ew mar kuşt. Ev çend sal di ser wê bûyerê re derbas bûn ku îro jî ez hatim cezakirin û ezê cezayê xwe bibînim. Lê ji bîr neke mîrê min, heqê kesê bo kesê namîne. Sibê tu jî dê cezayê xwe bibînî. Piştî van gotinên aqilane mîr baxçevan efû kir.



www.arsivakurdi.org

Her yek ji Bexdaya xwe tê

Dibêjin pîremêrekî zana li gel neviyê xwe di rêya Bexdayê de diçin Bexdayê. Di rê de mirovek hate pêşiyê silav û oxir dan hevûdu piştî xweş û beşê piremêrî zanî ku ev rêwî ji Bexdayê tê. Gotê:

-Em ber bi Bexdayê ve diçin. Bexda çawa ye, em hê negihîştinê tê der barê wê de çi bêjî ji me re?

Rêwî got:

-Ezbenî ma çi bêjim, çawa behsa feyz û bereketa Bexdayê bikim. Bexda... Bexda ji dewra Harûnreşîd heta niha darusselam e. Cihê aştî û xêrxwaziyê ye. Hemî sikak mizgeft û tekyexane ne. Çi sikaka ku tu biçiyê zimêna Quranê ye. Here vê sikakê dersê hedîsan, here ya din tefsîr e, jêrtir here fiqh e, were jorî kelam e, xwe berde aliyê Çemê Dîcle dersên belaxet û edebiyatê ne. Yanî cihê tu biçiyê, ilm xwendin û zanîn e. Dikan tijî tiştên elaqîmet û erzan. Ji Hindistan û Pakistanê dexl, beharat, qumaş û her tiştê baş tê. Ezbenî Bexda nayê gotin. Divê mirov bi xwe here û bi xwe bibîne. Naxwe ez çend bêjim dîsa kêm e. Herin oxira we ya xêrê ye. Bi îzna Xwede hûn dê bibînin bê ka çi Bexda ye.

Piştî rêwiyê camêr ev gotin hemî kirin ji cem rêwiyên me rabû kete rêya xwe. Her du rêwiyên me jî rabûn, berê xwe dane oxirê ku zûtir bigihên Bexdayê...

Qederekê çûn di xanekê de bêhna xwe vedan, wî zemanî rê dûr bûn, wekî niha bi tirimbêlan du-sê seet nebûn. Rêwîtiya Bexdayê bi rojan bû. Hele mîrovên pîremêr yekcar nedikarîn zû herin, ji ber hindê rêwîtiya wan hê dûrtir û derengtir dibû. Lê xema kesî nebû rêya dûr. Lewra di her qonaxekê de xaneke baş hatibû çêkirin. Mirovên rêwî di van xanan de dibûn mêvan, di diravekî kêm hem xwarin dixwarin û hem jî li odên xanê bênvedanake mikûm dikirin û roja paştir diketin rêya xwe. Vêca pîremêrê me yê zana jî li gel hevalê xwe li xaneke wiha bibû mêvan.

Helbet hin mirôvên din jî di xanê de hebûn. Yek ji wan mirovan jî ji Bexdayê dihat. Dema pîremêrê me yê zana dît ku mirovek ji Bexdayê tê meraq kir û jê sual kir ka Bexda çawa ye, lewra ew jî diçûn Bexdayê.

Rêwiyê ji Bexdayê dihat got:

-Ezbenî Bexda... Bexda ye. Bexda cihê kêf û zewqê ye. Here vî alî melha ye here aliyê din meyxane ye. Heta banga sibê li qeraxên Dîcke dans û duwist e, reqas û leyz e. Di meyxaneyan de dengê çengê û neyê, ribab û pîkê diçe ber esmanê ezîm. Di koşk û serayan de ehlê sefahetê heta spêdê kêfê dikin. Ji Çîn û Hindistanê şerabên xalis tên û kî dixwaze vedixwe. Ma çi bibêjim, çi behsa Bexdayê bikim. Hûn herin hûnê bibînin ka Bexda çi Bexda ye.

Piştî rêwiyê ji Bexdayê hat ev gotin kirin rabû ji wir çû. Lê serê neviyê pîremêrê zana tevlihev bû. Gote yê zana:

-Bapîr, ez tênegihîştim ka ev çi ye? Te ji yê pêşiyê sual kir wî behsa Bexdayê bi awayekî baş kir, behsa zanîn û xwendinê, îbadet û camêriyê kir. Lê viyê din behsa melhan û sefahetê kir, kîjan ji van rast e?

Pîremêrê me serê xwe hejand, girnijî û got:

-Berxê min, her du jî rast dibêjin. Hindî ku mirovê pêşiyê bû, ehlê ilm û xwendin û zanîn û medresê bû. Ehlê terîqet û heqîqetê bû. Li Bexdayê jî di nav van civatan de bû. Ji ber hindê tu kesê din nedidît. Wî her dem mirovên ehlê xwendinê û zanînê didîtin.

Yê em nû li gel axaftin jî ehlê sefahetê bû û mirovekî sefîh bû. Ji ber hindê wî jî ji yên wekî xwe zêdetir kesek nedît. Rast e her du jî ji Bexdayê tên, lê her yek ji Bexdaya xwe tê...

www.ansvakurd.org

Şêx Nûreddîn

Rast û çep tîr dane canî rast û çep
Qews waş tozê kevanî rast û çep

Bê dil û însaf û zalim fitne xîz
Sîne xerbal kir nihanî rast û çep

Ez di xew da bûm me dî bê murwetan
Rête canê min nîşanî rast û çep

Tir û rim dil ma di navê helqereng
Min bi ehwalê nezanî rast û çep

Erd e dil lew we dibarit her li ser
Şubhê qetrê asîmanî rast û çep

Xem ji min nahilgirit lew huccetan
Lêk tekbîr tên bihanî rast û çep

Lê me her dewran e şubhê kiljinê
Em li dewra baxebanî rast û çep

Vê cefayê her li nefsa xo dikit
Bes yek in bê şik ne sanî rast û çep

Ez birîndarê kevanê mal helak
Ev Zelîxayê zemanî rast û çep

Lê bila nûrî feda bit her tenê
Dilberê bînim te Xanî rast û çep

Ehmede Muxtar e dilber Nûriya
Ka mirad û kamiranî rast û çep

Cergê êtûnî te kir armancî tîr
Şubhetê Şêxê Yeman î rast û çep

www.arsivakurd.org

"Dîwana Kurmancî" klasîkan dide nasîn

HUSEIN MUHAMMED



Kitêba "Dîwana Kurmancî" di nav 120 rûpelan de 12 şairên klasîk yên kurmanc dide nasîn û hin ji helbestên wan pêşkêşî me dike. Hin ji wan ji me hemûyan re nas in, wek Elî Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Melayê, Pertew Begê Hekarê û Şêx Nûredînê Birîfkanî lê hinan jî belkî pirraniya me xwendevanan hê navê wan jî nebihîstiye, wek Mensûrê Girgaşî, Mîna, Macin û Sadiq.

"Dîwana Kurmancî" sala 1971ê li Başûrê Kurdistanê bi alfabeya erebî hatiye nivîsîn. Di wê demê de wê gelek rastiyên ko hingê nedihatin zanîn yan jî şaş hatibûn zanîn ron kirin. Pirtûk duyem car e ko bi alfabeya latînî derdikeve. Ew berî niha li salên 1980yan li Swêdê hatibû çapkirin. Niha jî ew ji weşanxaneya "Dîwan" li Stembolê belav bûye.

Kitêb ji aliyê Ebdurreqîb Yûsif ve hatiye nivîsîn. Nivîskar gelek ji helbestên di berhevokê de di nav defterekê de vedîtine, li wan vekoliye û ne tenê ew weşandine lê herwiha derbarê helbestvanên wan de jî agahiyên hêja dide. Ew hem kûr li serdemên jiyana şairan hûr dibe û gelek ji şaşiyên wêjenasên berî xwe sererast dike. Herwiha wî hin ji serpêhatî û çîrokên derbarê wan şairan de, ko li gel belav in û wî bi xwe bihîstine û berhev kirine, neqlî kitêbê kirine.

Nivîskar hin teoriyên balkêş li ser sedemên destpêbûna nivîsîna bi kurmancî pêşkêş dike. Bo nimûne, bi texmîna wî piştî duparçebûna Kurdistanê di navbera Îran û Osmaniyan de, kurdên kurmanc – ko pirraniya wan ketin nav tixûbên Imparatoriya Osmanî de û ji Îranê veqetîn, êdî hinekî xwe nîv-serbixwe dîtin: mîrek û mîrgehên wan xweser û otonom bûn. Herwiha ew êdî ne parçeyeke ji Imparatoriya Îranî bûn û êdî xwe bi gelên din yên îranî ve girêdayî

www.arsivakurd.org

nedîtin. Lê madem ko ew ji alî zimanî ve gelek ji osmaniyan dûr bûn û bi pirranî qet ji zimanê wan jî fehm nedikir, ev bû sedem ko bi zimanê xwe binivîsin. Berevajî kurmancan, soran zêdetir nêzîkî farisan man loma nivîsîna bi soranî gelek ji ya kurmancî derengtir dest pê kir (kurmancî ji sedsala 15ê ve anku 1400 lê soranî tenê ji sedsala 19ê ve anku 1800).

Kitêb ji alî Ziya Avci anku "Elîşêr" ve hatiye latînîkirin. Mixabin ti pêşgotinên wî bi xwe di kitêbê de cih negirtine. Wisa diyar e ko kitêb bi devoka behdînî hatiye nivîsîn û Avci ji bilî transkrîpsiyonê ew herwiha adapteyî kurmanciya nivîskî ya bi alfabeyên latînî jî kiriye. Ji zimanê kitêbê diyar e ko ew ne tenê tîpguhêzî ye lê herwiha "werger" yan jî "venivîsîn" e jî.

Pêşgotineke M. Xalid Sadinî li destpêka kitêbê hatiye danîn. Ew tê de behsa serpêhatiya xwe ya li gel kitêbê dike û bi dilkulî diyar dike ko ew yek ji kitêbên pêşîn yên ne-dînî bûye ko wî bi kurdî xwendiye û tevî dijwariya xwendina bi alfabeya kurdî-erebî jî, ew gelek di bin bandora wê de maye. Herwiha diyar dike ko wî bi xwe jî di dema xwe ya li zindanê de kitêb veguhastiye ser alfabeya kurdî-latînî lê ji ber sedemekî



Ebdulrreqîb Yûsif: "Dîwana Kurmancî–Şairên Klasîk ên Kurd" Latînîkirin: Ziya Avci, Weşanxaneya Dîwan, 124 r., Stembol 2012.

ko diyar nake, dibêje ko wî dubareweşandina kitêbê bi tîpguhêziya Ziya Avci baştir dîtiye.

Kitêb bi zimanekî xweş hatiye nivîsîn û xwendina wê sivik e. Mixabin li gelek deran li cihê herfa "ê" tîpa "e" hatiye nivîsîn. Herwiha ji ber ko kitêba orijînal li Başûrê Kurdistanê hatiye nivîsîn û tê de gelek navên kitêban yan jî hin biwêj û gotin bi erebî hatine nivîsîn û – ji ber ko bi taybetî wê demê kurdan li wê derê ji kurdî zêdetir bi erebî dixwend – wî hewcedarî bi wergerandina wan nedîtiye. Bo nimûne, ew navê kitêba navdar ya Dr. Blêç Sêrko bi erebî wek "Qediye'l kurdî" dide lê divê ev di kitêba kurdî-latînî de wek "Doza kurdî" yan jî bi navê xwe yê fransî yê orijînal "La question kurde" bûya.

Pirtûk gelek zanyariyên hêja pêşkêş dike tevî ko şairên nenas yên wek Mensûrê Girgaşî, Mîna, Macin û Sadiq dîsa di serê me de wek nîşanên pirskirinê dihêle. Lê li ser şairên din hê jî zanyariyên berfirehtir û geh-geh rasttir jî derketine. Mixabin kitêb wisa nehatiye redaktekirin ko ev zanyarî werin sererastkirin yan jî lêzêdekirin.

Dîsa jî dubareweşandina vê kitêbê hêjayî pesndan û xwendinê ye. Ew hem vê lêkolînê dîsa berdest dike û hem jî destpêkerên edebiyatnasiya kurdî dikarin ji wê dest pê bidin û paşî li ser her şairî xwe bigihînin agahiyên berfirehtir.

www.arsivakurd.org



Îslam

Fikrî Amedî

"Ya Rebbê me! Me bike du evdên ji te re teslîmbûyî û ji zûriyeta me jî, ummeteke teslîmî te bûyî derîne. Cihê îbadeta me nîşanî me bide û tobeyên me qebûl bike. Lewra yê tobeyan qebûl dike û rehîm hew tu yî." **(Beqere: 128)**

Mane û Mahiyeta İslamê

Peyva Îslamê di ferhengê de tê maneya teslîmbunê, stûxwarkirinê û îteatkirinê. Ji ber ku dînê Îslamê; ji emrê Xwedê teala re teslîmbûn e û tenê jê re îteat tê kirin, ev nava girtî ye. Maneya Îslamê ya istilahî jî tê vê maneyê: "Nîzameka emelî û îtîqadî ye ku ji aliyê Xwedê teala ve bi wasita pêxemberan ji mirovan re hatiye şandin û şiklê jiyanê ye ku li dinya û axretê mirovan mesûd û bextiyar dike. Îslam qanûneke îlahî ye ku mirovên xwedî aqil dibe ser rêya bixêr.

Îslam, navê dînekî teybetî ye ku Xwedê teala ji bo mirovan hilbijartî ye. Îslam, rêya ji rebbê alemê re teslîmbûna benîadem e. Îslam benê di navbera mirovan û Xwedê teala de ye. Îslam şiklê jiyaneke bextewar, di nav aşîtiyê de, bi rûmet û bi îzzet nîşanî mirovan dide.

Koka peyva Îslamê ji fiîla "selîme-sîlm" tê.

www.arsivakurd.org

Selîme, tê maneya aşîtiyê. Peyvên wekî "selm, sîlm, selam jî ji eynî kokê tên û tê maneya aşîtiyê. Peyva selem jî ji eynî kokê tê û tê maneya kirina aşîtiyê, lihevhatinê û bi perê pêşîn mal kirînê. Esleme tê maneya aşîtî kir, ket aşîtiyê û li ser şertê aşîtiyê sekinî. Peyva selîme tê maneya stûxwarkirinê û îteatkirinê jî.

Peyva "selîme" tê maneya silametê, xelasiyê û ewlebûnê jî. "Eslame" tê maneya xêr û qenciyê.

Peyva Îslamê ku ji koka esleme tê, tê van maneyan:

1. Ketina aşîtiyê, aşîtî kirin.
2. Stûxwarkirin, îteatkirin û qebûlkirin.
3. Ketina Îslamê
4. Ji Xwedê teala re teslîmbûn û xwe bi Xwedê teala ve girêdan.
5. Îxlas û semîmiyet
6. Danûstanin, bi pêşin pere dayîn û bi deyn mal stendin.

Îslam navê dînê semawî (îlahî) ye ku ji hemû pêxemberan re hatiye şandin. Lewra çavkaniya wehya îlahî yek bi tenê ye û ew jî Xwedê ye. Ev dînê îlahî ku Xwedê teala navê wê Îslam daniye, bi Mûhemmed (s) gihîştiye kemalê, ji aliyê hemû hukman ve temam bûye, hemû prensîbên wê ji aliyê Mûhemmed (s) ve hatine îzahkirin û rêyeke hîdayetê ye. Muheqqeq li cem Xwedê dîn, hew Îslam e. (3/ Alî- Îmran:19), navê yên ku bi vî dînî bawerî anîne Misilman daniye (22/ Hecc:78). Pêxemberên berê jî Misilman bûyn û ên bi wan bawerî dianîn jî Misilman bûn. Wan pêxemberan jî mirovatî bi tenê dawetî Îslamê dikirin. **(2/Beqere, 128, 131-133, 135-136; 3/ Alî- İmran, 20, 67).**

Kesê ku ji Îslamê re teslîm bibe û pê bawerî bîne wekî "muslim" yan jî "misilmam" tê binavkirin. Muslim tê maneya mu'minê bawerî aniye. Mu'mîn jî, muslimekî ji Îslamê re teslîmbûyî ye. Mu'min bê şek û guman bi Îslamê bawerî aniye. Di nava wê baweriyê de ewlehî jî heye teslîmbun jî heye. Hinek mirov dibe ku ji ber mezinbûn û hêza Îslamê (li gor maneya wê ya ferhengî) teslîm bibin û ji otorîteya Misilmanan re serî bitewînin. Lê baweriya xwe bernede dil, fehma îteata ku xwe li ber prensîbên Îslamê bi dil û yeqîn teslîm neke, bêqîmet e. (49/Hicûrat, 14).

Eger kesek bi zimanê xwe peyva şehadetê bîne yan jî bibêje ez "Misilman im" ew li gor hukmê Îslamê Misilman e. Lê eger baweriyê di dilê wî de reh û koka xwe bernedabe Misilmantiya wî li ser zimanê wî ye. Îslam hem bawerî ye û hem jî prensîbên wê di jiyana xwe de tetbîqkirin e. Eger bawerî ketibe dil mirov ji bo ku prensîbên baweriyê bîne cî xîret dike. Mirovên ku bibêjin em Misilman in û paşê her karê pîs û xerab bikin, yan baweriya wan zeîf e yan jî bêbawer in. Bawerî, însanan ji xerabiyan diparêze û xwediyê xwe ber bi karên salih ve dike.

Du beşê Îslamê ên esasî hene. Ev 1- Eqaîd, 2- Şerîet e.

Di beşên eqaîdê de prensîbên Îslamê ên baweriyê hene. Însanek wê çawa bawer bike, wê çi qebûl û çi red bike mijara eqaîdê ye. Qismê şerîetê jî muamelat e, îbadet e, qaîde û usulên ku di nav malbatê, civakê danûstandinê, têkiliya navbera mirovan, sûc û cezayên ku wê li sûcdaran bê kirin û exlaqê Misilmanan ku wê di jiyana xwe de tatbîq bikin.

Di Quranê de Istilaha Îslamê

"Ya Rebbê me! Me bike du evdên ji te re teslîmbûyî û ji zûriyeta me jî, ummeteke teslîmî te bûyî derîne. Cihê îbadeta me nîşanî me bide û tobeyên me qebûl bike. Lewra yê tobeyan qebûl dike û rehîm hew tu yî." **(Beqere: 128)**

Dema Rebbê wî jê re gotibû: "Teslîm bibe." Wî jî gotibû: "Ez teslîm bûm ji Rebbê hemû

www.arsivakurd.org

aleman re." **(Beqere:131)**

Îbrahîm ev, ji zarokên xwe re jî wesiyet kiribû. Yaqûb jî (wesiyet kiribû û) gotibû: "Zarokên min! Xwedê ji bo we ev dîn hilbijartiye. Û bi Misilmanî bimirin." **(Beqere:132)**

Ma qey dema ku Yaqûb kete ber (halê) mirinê, hûn li wir amade bûn? Wê demê Yaqûb ji zarokên xwe re gotibû: "Hûnê di pêy min re ji kê re îbadetê bikin?" Wan jî gotibû: "Emê ji îlahê te re, ji îlahê kalanê te Îbrahîm û Îsmaîl û Îshaq re; ku îlahekî bi tenê ye. Em ji wî re teslîm bûne." **(Beqere:133)**

(Gelî misilmanan) bibêjin: "Me bi Xwedê û (Qur'an) a ku (wî) ji me re daxistiye; bi ya ji Îbrahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb û neviyên wî re daxistiye; bi yên (wî) dane Mûsa û Îsa; û yên (hemû) pêxemberan ku Rebbê wan daye wan, bawerî aniye. Em tu cudatiyê nakin navbera yekê ji wan jî, û em tenê teslîmî Xwedê teala bûne." **(Beqere:136)**

Muheqqeq li cem Xwedê dîn, hew Îslam e. Ew ên ji wan re kitêb hatiye dayîn, piştî ku ji wan re zanîn hat, ji ber çavnebariya nava xwe bi hev ketin. Kî ayetên Xwedê înkar bike; bila bizanibe ku Xwedê, hesab sivik e (pirr zû dibîne). **(Alî Îmran:19)**

Kî ji (dînê) Îslamê pê ve, li dînekî din bigere, ew (dîn) ji wî nayê qebûlkirin. Û ew kes li axîretê jî di ziyanê de ye. **(Alî- Îmran:85)**

Êdî îro ew ên înkar kirine, ji (xerabkirina) dînê we bêhêvî bûne. Ji wan netirsin, ji min bitirsin. Min îro dînê we kamil kir û ni'meta xwe li ser we temam kir û min ji we re Îslam hilbijart. **(Maîde:3)**

Xwedê bixwaze kê bigihîne hîdayetê, sînga (dilê) wî li Îslamê vedike. Bixwaze kê jî bixerifîne- wekî ku ber bi asîmanan ve bilind dibe- sînga wî teng dike û dişidîne. Xwedê, li ser kesê ku bawerî neaniye a wiha gemarê direşîne. Ev (Îslam û Qur'an) rêya rast, rêya Rebbê te ye. Em ji qewmekî ku şîretan digirin û difikirin re ayetên xwe yek bi yek beyan dikin. **(En'am:125-126)**

Bibêje: "Nimêja min, îbadeta min, jiyana min û mirina min, ji bo wî Xwedayê rebbê alemê ye." **(En'am:162)**

Kî bi qencî berê xwe bi alî Xwedê ve bike; bêşik wî bi qulpê herî saxlem girtiye. Aqûbeta hemû karan digihîje Xwedê. **(Loqman:22)**



www.arsivakurdi.org

Xwedê sînga kê ji Îslamê re vekiribe; ma ew ne li ser nûreke ji rebê xwe ye? Êdî wey li halê wan kesên ku dilê wan ji aliyê zikra Xwedê ve pêt û hişk bûye. Ew di nav xerifiyeke eşkere de ne. **(Zumer:22)**

Ma ji wî kesê ku dema ji Îslamê re tê dawetkirin û ew bi bêbêxtî derewan li Xwedê teala dike zalimtir kî heye? Xwedê, civata zaliman nagihîne ser rêya rast. **(Seff:7)**

Di Hedîsên Şerîf de Îslam

Hedîsa Ebû Hureyre (r.): Wiha got:

Rojekê Nebî (s) derketibû nava mirovan û runiştî bû. Zatek hate balê û jê pirsî got: "Îman çi ye?" Kerem kir got: "Îman, baweriya bi Xweda, bi melaîketên wî, bi gihîştina Xweda, bi pêxemberên wî û bi saxbûna paşîn e."

Pirsî got: "Îslam çi ye?" Kerem kir got: "Ew e ku ji Xweda re îbadetê bikî û tu tiştekî jê re nakî şirîk, nimêjê bikî, zikata hatiye ferzkirin bidî û rojiya Remezanê bigirî."

Pirsî got: "Îhsan çi ye?" Kerem kir got: "Herwekî ku tu Xwedê teala dîbînî û ji wî re îbadetê bikî. Bêşik tu wî nebînî jî, muheqeq ew te dibîne"

Pirsî got: "Qiyamet kengê ye?" Kerem kir got: "Di vê meselê de yê jê tê pirsîn, ji yê pirs dike alimtir nîne. Lê ezê xebera elametên wan bidim te: "Gava cariye efendiyê xwe biwelidîne û gava şivanên devan ên ku kes bi wan nizane, di lêkirina avahiyan de bi hev re pêşbaziyê bikin. (Wextê qiyametê) ji pênc tiştan yek e ku Ji Xweda pê ve kes pê nizane. Paşê Nebî (s)ev ayet: "Bêşik ilmê seeta qiyametê li bal Xweda ye. Baranê dibarîne û bi tiştê di rehîman de ye dizane. Kes nizane ku wê sibê çi bi dest xwe bixe. Tu kes jî nizane ku wê li ku derê bimire. Bêşik Xweda, zana ye û xeberdar e. (Loqman:34) xwend." Paşê ew şexis zivirî çû. Paşê Resûlullah (s) emir kir ku wî bizivirînin lê li tu ciyekî rastî şopa wî nehatin. Di ser vê yekê re kerem kir got: "Han ev Cîbrîl (a) bû. Ji bona ku dînê mirovan nîşanê wan bide hat."

Ji Îbnî Umer (r) hatiye rîwayetkirin.

Wuha got: "Resulullah (s.a.v.) kerem kir got: "Îslam li ser pênc tiştî ava bûye. Şehadetanîna ku ji Xwedê pê ve îlah tunin û Mûhemmed Resûlê Xweda ye, nimêj kirin, zikat dayîn, çûyîna heccê û girtina rojiya Remezanê ye." **(Buxarî û Mislim)**

Ji Ebû Hureyre (r) hatiye rîwayetkirin:

Wiha gotiye: "Resulullah (s) kerem kir got: "Li min hate emirkirin ku heta însan tev bibêjin: "la îlahe îlallah" ez bi wan re şer bikim. Kî bibêje la îlahe îlallah ji aliyê min ve ji xeynî qisasê ku heqê Îslamê ye, mal û canê xwe parastiye û hesabê wî jî li ser Xwedê ye." **(Buxarî û Mislim)**

Hedîsa Ebû Bekir û Umer (r)

Ebû Hureyre (r) wiha got: "Di ser wefata Resulullah (s) re Ebû Bekirê Siddîq bu xelîfe û nêt kir ku esker bi ser qebîleyên Ereban ên ku îrtîdat kirine û zivirîne kufra xwe ya berê de bişîne."

Umer gotibû:

- Ey xelîfê Muslimanan! Ma tu yê çawa li hemberî van şer vekî? Resûlullah (s) gotibû: "Em Misilman memûr in ku hetta muşrik dibêjin "la îlahe îlallah" bi wan re şer bikin. Ji wan kî vê kelîma şehadetê bibêje, heqqê Îslamê ne tê de, malê xwe û nefsa xwe ji min parastiye û hesabê wî jî, li ser Xwedê ye. Xelîfe wuha bersiva wî da:

- Welehî ji van kî nimêj û zikatê ji hev

www.arsivakurd.org



biqetîne ezê bi wan re şer bikim. Lewra zikat heqekî malî ye. Ez bi Xwedê sond dixwim ku, evan karikek mê ku didan Resulullah (s) ji min bisitirînin; ji ber vê ezê stûyê wan bişkînim.

Di ser vê yekê re Umer got:

- "Welehî min fahm kir ku, ev hukmê ku xelîfe di heqê murteciyan de daye, ji Xwedê teala berhemek fireh e ku xistiye dilê Ebû Bekir. Di vê sayê de min fêm kir ku şer heqq e, loma min Siddîq tesdî kir. **(Buxarî û Mislim)**

Hedîsa Îbnî Ebbas (r)

Wiha got: "Gava Resûlullah (s) Muaz Îbnî Cebel (bi walîtî û qadîtî) şand Yemenê, wiha got: "Tu ji qewmekî ku ehlê kitêb in re diçî. Ji ber vê yekê tiştê tu yê ewil wan gazî bikî bila îbadeta ji bona Xwedê be. Gava Xwedê nas kirin, vê xeberê bide wan ku Xweda di nava rojê û şevê de pênc wext nimêj li ser wan ferz kiriye. Gava ev jî kirin vê xeberê bide wan ku Xwedê ji malê wan zikatek ku bidin xizanan ferz kirîye. Gava îteat kirin wê ji wan bistîne. Lê ji malê xelkê yê herî qenc xwe biparêze." **(Buxarî û Mislim)**

Hedîsa Eyyub el-Ensarî (r)

Bi rastî kesekî ji Resûlullah re wiha got: "Ya Resûlullah ji min re emelekî ku wê min bixe cennetê bibêje." Civata li wir hazir bûn heyreta xwe anîn ziman û gotin: "Çi bi vî bûye, çi bi vî bûye?" Resûlullah (s) kerem kir got: "Ma çi ye îhtiyaca hînbunê? Û dewam kir got: Ji Xwedê teala re evdîtiyê dikî û tu tiştekî jê re nakî şirîk, nimêja xwe dikî, zikata xwe didî û muameleyek baş bi merivên xwe re dikî." Pêxember (s) li ser heywan bû (ji bona ku vî zilamî hefsar û rişima heywan girtibû) jê re got hevsar berde. **(Buxarî û Mislim)**

www.arsivakurdi.org



Baweriya rast û îstîqamet

MIHEMED JIYAN

www.arsivakurdi.org

Îstiqrar-Îstiqamet

"Naxwe wekî ku li te hatiye emirkirin rast û durist be. Bila yên di gel te tobe kirine jî rast û durist bin. Pîvanên heq û edaletê şaş nekin. Xwedê teala kirinên we bi heqî dibîne"(1)

Xwedê teala di vê ayetê de li Resûlê Ekrem (s) emir dike ku; berê xwe bide rêya heq û bi îstiqrareke qewîn tê de bimeşe. Venegere çep û rastê xwe û fetl û fêlan nede xwe. Neçerixe û averê nebe. Çawa ku li te hatiye emirkirin, di rêya dînê Xwedê de rast û durist bimeşe. Îstiqameta xwe şaş neke. Ber bi hedefa dawîn ve, bi gavên ewle bimeşe.

Herwiha di şexsî wî de ji me tevan re dibêje: Di jiyana xwe de edaletê ji dest nedin û di emelên xwe de rizaya Xwedê her wextî li ber çav bigirin. Ji bo ve jiyana dinyayê ya çend rojan li pey nefsa xwe neçin û nebin musteheqê ezabê cehennemê. Tenê ji Xwedê re îbadetê bikin û tu şirîkan jê re çênekin. Eger ku hûn bixwazin bigihên Xwedê ew pir nêzîk e, ji şahdamarê we jî nêzîktir e. Dema ku îhtiyacî û kêmasiyên we çêbûn destê xwe li ber rebbê xwe vekin û jê daxwaz bikin. Lewra ew hez dike ku evd jê bixwazin û ew jî duayên wan qebûl bike.

Tobe

Heta ku evd evdîtiya xwe û ecziyeta xwe baş ferq nekin, Xwedê jî li gorî wê muamelê bi wan re nake û rehmeta xwe ji wan re naşîne. Ji bo ku rehmeta Xwedê bi ser wan de were divê pêşî ew bi evdîtiya xwe zanibin û her demê daxwazan ji wî bikin. Eger ne ji duayên evdan bûya û poşmaniya wan tuneba tu qîmetê wan çênedibû.

Tobe di dînê Îslamê de xwedî ehemmiyeteke pir mezin e û cihekî muhîm digire. Xwedê teala dixwaze ku, evdên wî her wextî tobe bikin, lê vegerin û berê xwe bidine wî. Da ku bi emelên xwe, xwe qure nekin û xwe mezin nebînin.

"Gelî yên ku bawerî anîne, bi dilekî safî li ber Xwedê tobe bikin. Hêvî heye ku rebbê we xerabiyên we veşêre. Her wiha we di gel Pêxemberê xwe û bawermendên pê re bixe cennetên ku di binê wan re çem diherikin. Nûra ku ji wan derdikeve pêşiya wan û aliyê wan î rastê ronî dike. Ew kes dibêjin: 'Rebbê me! Nûra me temam bike, me bibexişîne, lewra qeweta te bi heqî digihê her tiştî." (2)

Eger tobe neba, me dê nizaniba ka qeweta me çi ye. Me yê li ber Xwedayê xwe îsyankarî kiriba û emê ji ser xwe ve biçûna. Lê bi saya tobê û îstixfarê em bi heddê xwe dizanin û em berdestî qudreta xwediyê roja dawîn dibin.

Ebû Eyyûb el-Ensarî di hedîsa Mislimê de wiha rîwayet dike: "Resûlullah (s) wiha got:'Ez bi Xwedayê ku nefsa min di destê wî de ye sond dixwim, eger we guneh nekiribana wê Xwedê hûn helak bikirana û dê di şûna we de civakeke din bixuliqanda. Dê wê civakê jî tobe bikira û dê Xwedê jî gunehên wan efû bikira."(3)

Rebbê me di şexsê cenabê Mûhemmed (silavên Xweê lê bin) de vê mesajê dide me: Bi rastî axret ji bo we ji dinyayê bixêrtir e. Ma dema ku hûn rêşaş bûn, Xwedê rêya rast bi ber we nexist? Ma dema hûn feqîr bûn, Xwedê hûn zengîn nekirin? Naxwe emanet ha neheqiyê li feqîran nekin. Nîmetê xwedayê xwe bi minnet û şukranê bînin bîra xwe.

Baweriya rast

Xwedê teala însan ji bo armanc û hedefekê xuliqandine û rêya ku divê tê re bimeşin daniye ber wan. Di tevayiya dîrokê de pêxemberên ku rêya heq bi ber însanan bixin şandine. Hinek pêxember bi suhûf, hinek jî bi kitêban hatine şandin. Carinan bi hezaran însanan bawerî bi van pêxemberan aniye, car jî hatiye ku malbata

www.arşivakurd.org



wan bi xwe jî bawerî bi wan neaniye. Lê belê dîsa jî Xwedê însaniyet bê reber nehiştiye û muheqeq di her dem û tarîxê de pêxember şandine. Ev rewş di ayetê de wiha tê gotin: "Heta ku em pêxemberekî ji civakekê re neşînin, em wê civakê nadin ezabê."(4)

Xwedê di her zemanî de mesajên ronîker ji evdên xwe re şandine û ew bê rêber nehiştine. Ev rastî di vê ayetê de bi awayekî vekirî û zelal tê îzahkirin:

"Muheqeq me ji her ummetekê re pêxemberek şandiye ku ji wan re wiha gotiye: "Evdîtiya Xwedê bikin, ji rêşaşkeran dûr bisekinin." Hinek ji wan hatin ser rêya rast, hinek ji wan jî ketin rêya şaşiyê."(5)

Daxwaza însanan bi bal xwedayekî û mabûdekî ve tiştekî fitrî ye û însan tu carî bê mabûd nemane. Ji bo ku însan hîssên xwe yên manewî tetmîn bikin û xwe di emniyetê de bibînin her demê û her zemanî ji heyinekî/ê re îbadet kirine û xwe sipartin wî/ê. Ev daxwaz û îhtiyaciya manewî, fitrî ye. Însan, muheqeq dixwaze xwe bispêre hêzeke manewî ya xeybî. Ew bi ecziyeta xwe fêm dike ku îhtiyaciya wî bi xwedayekî û sitareyeke ku xwe lê bisitirîne heye.

Ji zemanê berî û heta niha ev îhtiyacî di hinek êl û qebîleyan de bi "totem"an tê qedandin. Ev eşîret, an jî civakên bi vî rengî her yek ji xwe re "totem"ekê çêdike û wî totemî ji xwe re wekî xwedayekî dibîne. Ev totem di hinekan de kêzik, di hinekan de çûk, di hinekan de qertel û di hinekan de jî wekî dînê Hîndûîzmê çêlek e. Hetta meriv dikare teyrê tawiz ê ku Êzîdî jî wekî sembolekî bi kar tînin wekî totemekê bibîne. Aniha çawa tê bawerkirin û çawa tê şîrovekirin, ew meseleyeke din e, lê ev sembol û nîşaneyên bi vî awayî ji çanda totemîzmê tên.

Herwiha di medeniyetên wekî Misir, Roma û Yewnanê de jî baweriyên nêzî van hebûn. Mumkin e ku temsîlên di van baweriyan de berê însanên qenc bin û piştre wekî îlah hatibin dîtin. Wekî ku tête zanîn Hûbel, Lat, Menat û Uzza însanên salih bûn ku piştî Nûh eleyhîsselam jiyabûn. Xelkê ji van însanan gelekî hez dikir û gelekî qîmet dida wan. Piştî ku wefat kirin jî Şeytan kete bin eqlê xelkê û xelk xapandin. Ji wan re got: "Ma hûnê van însanên salih jibîr bikin qey? Ma hûnê xatireya wan her demê sax nehêlin?" wan jî got: "Ma em çawa

www.arsivakurd.org

bikin ku em wan jibîr nekin?" Şeytan hema got: "Heykelê wan çêkin û deynin cihên xuya, bila her wextî li ber çavên we bin ku hûn wan jibîr nekin." Wan jî bi ya Şeytan kir û ji her yekî re heykelek çêkirin. Bi mirûra demê re, her ku nifşekî nû hat ew mezintir kirin. Heta ku her yek ji wan wekî îlahekî dîtin û îbadeta wan kirin. Êdî ew heykel jî bûbûne pût.

Wer dixuyê ku ew kesên bi navê Janus, Jupiter, Merkur, Minerva, Apollon, Zeus hwd. yên ku di dema Yewnan û Romayiyan de wekî îlah dihatin dîtin jî di dema xwe de kesên ezîz bûn û piştre wekî îlahên mîtolojîk hatine dîtin. Ev yek bi gelemperî di her bîr û baweriyan de hebûye. Di tarîxa Persan de Mîtra di ya Misirê de Îsis û di medeniyeta Anatoliayê de Kibele, nimûneyên vê yekê ne.

Tewhîd

Di suhûf û kitêbên ku ji aliyê Xwedê ve hatine şandin de, tevlihevî û keşmekeşî tune. Her tişt di wir de zelal e û eşkere ye. Di ayeta sûreyê Kehf de ev rewş wiha tê îzahkirin:

"Bibêje, ez jî beşerekî wekî we me. Tenê ji min re wehiy tê ku xwedayê we xwedayekî bi tenê ye. Îdî kî bixwaze ku bigihê xwedayê xwe bila emelekî qenc bike û bila di îbadetê de tu kesî neke şirîkê wî."(6)

Ev yek esasê tewhîdê ye. Lewra di dînê Xwedê de tewhîd heye ku bêyî tewhîdê tu emel nayê qebûlkirin. Xwedê li ser zimanê Loqmanê Hekîm ji me re qala şirkê dike: "Çawa ku Loqmanê Hekîm şîret li kurê xwe kiribû û wiha gotibû: 'Ey kurê min! Tu carî şirîkan ji Xwedê re çêneke. Lewra şirk, zilmeke pir mezin e."(7)

Nuqteya di vir de bala mirov dikşîne ew e ku Xwedê ji bo şirkê dibêje "zilm". Yanî şirk zilmeke mezin e. Lewra hêlîna xerabiyan û esasê neheqiyan "şirk" e. Kesê ku baweriya tewhîdê nizanibe û Xwedê wekî xaliq û îdarekerê vê kaînatê nebîne, wê hem zilmê li nefsa xwe bike û hem jî wê li însanan bike. Eger Umeyye b. Xelef ji Xwedê re şirîk çênekiribana xwe wekî xwedî û efendiyê Bilalê Hebeşî nedidît. Heke wî qebûl bikira ku xwediyê kaînatê Xwedê ye û em tev evdên wî ne û ferq di navbera me de tuneye; di wê germa Erebistanê de, pişta Bilal nedidanî ser qûma sincirî û latê qerase jî nedidanî ser zikê wî. Lê ji ber ku haya wî ji tewhîdê tunebû, yan jî tewhîd li hesabê wî nedihat,wî xwe wekî xwediyekî însanan didît. Herwiha wî, heqê ku neheqiyê li însanan bike û li gor dilê xwe hereket bike jî di xwe de didît. Sedemê vê yekê jî dûrbûna ji tewhîdê bû.

Dema ku seeta dawî hat û li sûrê hate pifkirin, her kes bi emelê xwe ve dimîne. "Însan mukafatê emelê xwe tenê dibîne" (Necm, 39)

Di dînê Xwedê de, her kes wekî hev e û mezinatiya tu kesî li ser ya kesekî din tune. Tevahiyê însanan evdên Xwedê ne û wê di hizûra Xwedê de jî li gorî emelên xwe muamelê bibînin.

Resûlê Ekrem ji keça xwe Fatimayê re dibêje: "Ey keça min Fatîme, wê roja qiyametê her kes bi emelê xwe hesabê xwe bide. Ji bo ku bavê te pêxember e, xwe di îbadetên xwe de sist neke. Lewra ez nikarim ji bo te tiştekî bikim."

1. Hûd, 112
2. Tehrîm, 8
3. Mislim 2748, 2749.
4. Îsra, 15
5. Nehl, 36
6. Kehf, 110
7. Loqman, 13

www.arsivakurdi.org



Mewlîd

Mela Ehmedê Xasî



Dîroka Qur'ana Pîroz

Prof. Dr. Muhemmed Hemîdullah

Werger: Murad Pola



Elîfbêya Kurdî

Xelîl Xeyaliyê Motkî

HÎVDA İLETİŞİM

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş Merkezi No: 20/45 Vezneciler İtanbul
Tel: 0212 519 59 45

www.arsivakurd.org


www.arsivakurdi.org